



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdi
Mihâd Bedîrخان

Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 132
Çiriya Pêşîn
October 1992
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Dewleta Kurd pîroz be!

■ Roja 4'ê Çiriya Pêşîn Meclîsa Netewî ya Kurdistana Başûr bi tevayiya dengan Dewleta Federal a Kurdistanê ilan kir.

■ Li her çar perçen Kurdistanê gelê Kurd û lankirina federasyonê bi kîf û şahiyan pîroz kir.

■ Dewletên mezin bêdeng man. Dewletên dagirkir ji bo biserneketina Kurdan ketin kefteftê. Ji bona ku pêşî li ber dewleta federe bigrin Tirkîye, İran, Sûriye û Suûdî Arebîstan di 14 û 15'ê meha Çiriya Paşîn de dicivin.

Di tarîxa modern a gelê Kurdistanê de bûyera herî girîng di roja 4'ê meha Çiriya Pêşîn de rû da: Meclîsa Netewî ya Kurdistana Iraqê bi tevayiya dengan "Kurdistan Federe" ilan kir. Meclîsa Netewî ya Kurdistana Iraqê di belavoka û lankirina Kurdistanâ Federe de ji peymana Sewrê heta iro qala dîroka têkoşîna gelê Kurd dike; Zordariyên dewletê kolonyalist, peymanen navnetewî û bêdengîya dînyayê jî derdixe berçavan. Û di dawiya belavokê de Kurdistanâ federe û lankirin.

"Meclîsa Kurdistanâ Iraqê, bi hemû dengan li ser navê gelê Kurdistanâ Iraqê biryar daye ku di vê qonaxa dîrokî de mafê çarenîvisâ xwe li gor peymanen navnetewî, li ser bingeha siyaneta ji bo mafêni mirovî û sistema demokratik ya pirr partîti di çarçewa Yekîtiya Federal de danûstandinan bi hukûmeta merkezî re bike."

Mesaja Barzanî û Talabanî

Parlementoyê ev roja mezin wek cejin qebûl kir. Vê nûçeyê di nav gelê Kurdistanê de heyecanek mezin, kîfxwesi û şadiyek bêtârif peyda kir. Televizyon û radyoyê programen xwe yên normal birrîn, bi marş û mesajan tevî pîrozbaşıya gel bûn.

Mesûd Barzanî û Celal Talabanî mesajek muşterek ji Meclîsa Netewî re şandin. Ew di mesaja xwe de weha dibêjin: "Biryara we ya federalî li gelê Kurd pîroz û bi xêr be. Ev biryar, biryareke kamiliya dîrokê ye. Hêvî û armanca muşterek a hemû Kurda ye. Ev biryar di hoyen gelek giran de bi



Meclîsa Netewî a Kurdistanê bi biryarek dîrokî Dewleta Federe a Kurd ilan kir (Foto: Şoreş Zirek)

saya xwîna şehîdan û yekîtiya gelê me hatiye stendin. Em li ser navê serokatî û Komîtên Merkezî yên PDK û YNK sozê didin ku

emê ji bo jiyandina Kurdistanâ Federe bi hemû hêza xwe bixebeitin".

Ilankirina Kurdistanâ Federe wek nûçeyekê mizgîniyê li hemû Kurdistanê û di nav Kurdên li derveyî welat de belav bû. Partî, rêxistin rojname, komele û dezgehê Kurdistanê bi beyan û belavokê xwe meclîs pîroz kirin û piştgiriya

xwe ji bo Kurdistanâ federe nîşan dan.

Bes PKK li dij vê biryare derket. Di beyan û komentarên xwe de dijminatiya Meclîsa Netewî ya Kurdistanâ Iraqê kir. Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan di beyaneka xwe de weha got; "Iro li

Dûmahîk: 11

Beyana û lankirina Dewleta Federe ya Kurd

Rûpel: 9

PKK'ê Sertê Hukûmeta Kurdistanê qebûl kirin !

Ordiya Romê, Dewleta Kurd a Federe tehdîd dike

□ Di 6'ê Çiriya Pêşîn de li Kurdistanâ Başûr di navbera hêzên hukûmeta Kurdistanê û gerillayêne PKK'ê de şer derket. Her du alî ji hevdu bi iddiyêne cûrbicûr gunehkar dikan. Hejmara kuştî û birîndaran heta nuha nayê zanîn.

□ Li gor protokolê; "PKK û hemû endam û alyîgirên wê teahud dikan ku, heta li ser erdê herêma Kurdistanâ Iraqê bin, wê hûmet qanûnen li herêma Kurdistanê bigrin".

□ Bi saya şerê li dijî hev, fîrsendeke mezin ket destê dewleta Tirk ku karibe bi hêzên hawayî û reşayî êris bibin ser kampêne PKK'ê û Dewleta Federe a Kurd ji tehdîd bike.



Ordiya Tirk bi tank û top û bi balafir û helikopterên Kobra ketin axa Kurdistanâ Iraqê

Di 6'ê Çiriya Pêşîn de li Kurdistanâ Başûr di navbera gerilayêne PKK'ê û hêzên dewleta federal a Kurd de şer dest pê kir. Her du alî ji li ser sebebêne şer hevdu gunehkar dikan. Li gor beyana Hu-

kûmetê tişten ku bûne sebeb ku şer di navbera wan û PKK'ê de derkeve ev in: "Hukûmet, Meclîs û Cepha Kurdistanâ Iraqê gelek caran PKK agahdar kirine ku ew hudûdê me û Tirkîye vala bike û

Dûmahîk: r.11

Mûrad Ciwan

Serê PKK û Pêşmergan û sebebê sebeban

Rûpel: 4

Protokola Hukûmeta Kurdistanê û PKK'ê

Rûpel: 3

Li Kurdistanâ azad civîna hêzên Kurdistanî

Rûpel: 3

Dewleta Federe, diyardeya miletbûnê û şertê hebûnê ye

Îlankirina dewleta federe ya Kurdistana Iraqê di demek wiha bêsans de pêk hat ku, Kurdên Kurdistana Tirkîyê ne hewes û dilbijokiya pîrozkirina wê bi dilekî şâ û bi serbilindî dîtin, ne jî fîrsenda têgihîstîn û fahmkirina mehna wê bîdest xistin. Herçî biryara îlankirina dewleta federe li Kurdistana Başûr, rojekê du rojan berî şerî pêşmergan û PKK derket, lê li Kurdistana Tirkîyê xebera vî şerî wêrankir zû bi zû wek ewrekî reş û tarî xwe xist navbera awîrênen mîlet û wê biryara pîroz. Çawa tûrêjîn rojê di pişt ewrêne reş û tarî de wenda dibin, ev xebera îlankirina dewletê jî di pişt hewa endîse, hêrs an nerazîbûna Kurdên Kurdistana Tirkîyê de wenda bû.

Ne ew tenê, ji ber awayê propoganda çapemeniya Tirkan û bêsek ji ya Kurdan ji bo rîlibergirtina peydabûna sempatiyekê li hember vê îlan û pîjikirina dijminatiyê di navbera Kurdên Kurdistana Tirkîyê û yên Kurdistana Iraqê de, gelek Kurdên Kurdistana Tirkîyê bi nerazîbûn û dilnexwaziyeq mezin ber bi vê dewleta federe çûn. Gelek idia û daxwazên ecêb li ser vê dewletê kirin. Hinekan gotin ku ev gav li gor plana emperyalîzmî hatîye avêtin, hinekan gotin dewleta Tirk li pişt îlankirina vê dewletê ye û hinekan jî, tevî van idîyan lê zêdekirin ku bi vê gavê serokên tevgera Kurdistana Iraqê durûfî û riyakariyê dîkin, xwedîgiravî ji aliyekevî ve dibêjin armancêne me parastina yekîti û tevayiya Iraqê ye, ji aliye din bi vê gavê ber bi perçekirina Iraqê de dicin.

Helbet meriv fahm dike ku di demek wiha bêsans de dewletêne dijmin û çapemeniya wan ji bo şelûkirina avê û xapandina raya mîlet çawa dixwazin her fîrsendê bi kar bînin. Û gava rûdanek wiha girîng di pişt mij û dûmanâ awir û hîssîn fûriyayî û bi kîn û endîse de, ji ber çavan winda dibin, meriv di kare dijminayefî û êrîşa hin Kurdan ji fahm bike.

Lê tevî hemû vê bêşansîya iroyîn û dek û dolabêne dijmin car-din jî wezîfe ew e ku, heta ji me tê em hîssîn xwe yên fûriyayî sar bikin, bi aqlê selîm, bi dûrbînîyek realist û bi şûrek milî li rûdanê binêrin, baş tê bigihîjin ku mahna vê rûdanê li her çar perçen welêt ji bo me Kurdan ci ye.

Dibe ku serok û hêzên ku bûne sebebê avêtina vê gava milî ne bi dilî me bin, dibe ku gelek şâşîtyen wan hebin. Li gor bir û baweriya meriv dibe ku heta "însanînî xerab, hevkarêne emperyalîzmî, di vî şerî birakujiyê de berpirsiyâr" ji bin. Eger wiha be jî ew nayê wê mahnê ku em rewş û rêvêçûna van serokan an hêzên wan û peydabûna vê qonaxa nuh di dîroka gelê Kurd de yan jî çêbûna vê muesesa milî tevî hev bikin. Na, hebûna kes û hêzên siyasi, rewşa wan a iroyîn yan jî hebûna wan tiştekî din û gavavê-tina mîletekî ber bi dewletbûnê tiştekî din e. Însan û kadir, ne dewamî ne, rewş û rêvêçûna wan ne rawestiyayî ye. Di qonaxa jiyanê de karin gelek biguherin. Heta iro hene, sibehî tune ne. Hebûna wan ne statik e, muweqet e. Lê gavavê-tina ber bi dewletbûnê, peydabûna muesesêne milî yên dewletbûnê, di ser van hemû bûyeran, hêzan, kadiran an serokan û kar û barêne wan re ye; rûdanekî ku diyardeya kemilîna jiyana gelekî ye ku wî ber bi mîletbûnê de pêşde dixe, dewamî ye, ne ji bo filan an bêvan kesî ye, bîzzat ji bo hebûn, li piya mayin, xweparastin û pêşveçûna mîlet bi xwe ye.

Loma jî iro em çiqas di rewşek dijwar û bêtalîh de bibin bila bibin, divê em muhawele bikin ku vê roja xwe ya iroyîn a muweqet û pêşeroja xwe ya ku qedera mîletê me pê ve girêdayî ye tevli-hev nekin, bi hîssîn fûriyayî pêşeroja xwe badîlhewa feda nekin.

Bi vê baweriye divê em bi pîrozbayî û bi serbilindi ber bi îlankirina dewleta federe ya Kurd de herin, lê xwedî derkevin, wê ji xeberen dijmin biparêzin, bixebeitin ku bicîhbibe, bikemile û ebedî be.

Şirnexa duyem: Pasûr

Dewleta Tirk bi hêzên xwe yên leşkerî û sivil îcar jî li Pasûre provaya qetliamê kir.

Li gor nûçeyen ku ji Pasûre têne, di 3'ê Çiriya Pêşin de gerilayen PKK'ê erebeyek e eskerî gullebaran dîkin û li ser vê bûyerê fermandarê qereqola Kulpê, Recep Comert emir dide hemû leşker û polisan ku "derseke baş" bidin xelkê. Li ser vê sê roj û sê şevan hemû riyen Kulpê hatin girtin û agir bera gelek mal û dikanan dan, şewitandin. Gelek malen xelkê talan kirin. Xwedîy hotêla Narin, Abdulvahit Narin tevî hotêla wî, şewitandin. Dewlet ji bo "ispat" bike ku bi terorîstan re şer kiriye, îcar hemû avayiyen resmî yên dewletê jî gullebaran kirin.

Di vê bûyerê de 4 kes hatin kuştin û gelek kes jî birîndar bûn. Lê ji bili A. Vahit Narin, kes nizane kuştîyên din kî ne. Pişti vê zulm û zora dewletê gelek kesan mala xwe ji qezê bar kirin.



Civîna Enstituya Kurdî ya Parîsê

Ji 24'ê Oktobrê heta 31'ê Oktobrê, li Swêdê, li girava Bîskop-sarnö'yê civîna 12'an a li ser zavarîye Kurmancî hat çêkirin. Civîn li ser pirs û pirsgirêkên zaravê Kurmancî bû.

Wekî tê zanîn Enstituya Kurdî ya Parîsê salê du caran civînêne weha yên li ser zaravê Kurmancî amade dike. Her weha pişti her civînekê jî bi navê Kurmancî rojnama nefîca civînê derdixe.

Li ser navê Armanc'ê M. Lewendî besdarî civînê bû. Besdarîn din yên civînê jî ev in: Hamît Kiliçaslan, Elîşêr, Muzeffer Begzade, Kendal Nezan, Mehmet Uzun, Z. Abîdin Zinar, Lutfî Baksi, Rojen Barnas, Reşo Zîlan, Veysi Zeydanli,

Civîna 12'an bi gîranî li ser termîn leşkerî, huqûqî û rezimani bû. Pêşniyara ji bo termîn leşkerî û rezimani jî ali Rojen Barnas, yên huqûqî jî ali Veysi Zeydanli ve hatin pêşkêşkirin. Her weha Hemît Kiliçaslan jî li ser termîn avahî û avakirinê pêşniyarek pêşkêşî civînê kir.

Dî dawîya civînê de bîryar hat girtin ku civîna bê di Nîsana 1993'an de disa li Swêdê bête amadekirin, her weha pêşniyara civînê ew bû ku Enstitû bikaribe hemû hejmarên Kurmancîye wek neficeya van civînan wek kitêbekê bide çapkirin.

Armanc
Rojnama Kurdi ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Eli
Zinarê Xamo
Hesen Mizgin
Mirza Bextiyar
Lewend Fîrat
S. Rêving
M. Lewendî
Redaktörê berpirsiyâr:
M. Eli
Berpirsiyârê beşê
Dimiliki: Malmışanij

Kongra Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîye civiya

PSK: "Heger politika dewletê bi vî awayî dom bike, ji bo parastina welat, şeref û mafîn xwe, hemû riyen meşrû berxwedan ne tenê tabii, lê edî pêwist e. Di vî warî de bê dudîlî wê Partiya me jî bi wezîfa xwe rabibe".

Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîye kongra xwe ya sisîyan di nîvî dawî yê meha Çiriya Pêşin de pêk anî. Di kongrê de programma partiyê hat guhertin, kelima "Tirkîye" hat derxistin, bes "Partiya Sosyalîst a Kurdistanê" ma. Pişti kongrê belavokek ji bo raya giştî hat belavkirin.

Kongrê ji bo avakirina cepheyekê bang dike: "PSK, gazî hemû partî, kom û yet bi yet welatparêzan dike; ji bo avakirina cepheyeke müşterek ya hêzên weletperwer, bixebeitin".

Kongra KUK'ê ya IV'êm

Yekîtiya KUK'ê pêk neanî

Demek berê kongra KUK'ê ya 4'êm civiya. Berî kongrê, KUK'ê komîsyonek ava kir ku yekîtiya xwe di kongra IV'êm de pêk bîne. Nûnerên KUK'ê yên her du aliyan jî di kongrê de besdar bûn, lê roja dawîn ya kongrê li hev nekirin; du kongrê cihê pêk anîn.

Li gor agahdariyan, piraniya nûneran kongra KUK'ê ya 4'êm, yên din jî kongra yekem ya PRNK (Partiya Rizgariya Netewî ya Kurdistanê) pêk anîn.

KUK di belavoka encamên kongrê de dibêje; "Kongra me sosyalîzmî wek ilmek, wek rîberêrek qebûl kir, lê divê ji tecrûben sosyalîzmî yên 70 salî ders bêa stendin".

PRNK'ê jî di belavoka dawî ya kongrê de dibêje: "Me kongra xwe bi irada piraniya kesen ku besdarî kongra KUK'ê bûbûn çêkir".

Her du kongreyan jî giringî dan yekîti û itifaqêni siyasi.

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Utgâs av:
Kurdiska
Demokratiska
Arbetarunionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonetî
Prenumeration
Abonetîya Salekê
Li Skandinaviya
150 SKR
Magam
Myndigheter
250 SKR
Li Ewrûpa
50 DM
Li derveyî Ewrûpa
40 \$
Anons/ilan
nîv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Li Kurdistanâ azad civîna hêzên Kurdistanî

Li ser bangâ serokê Parlamento ya Kurdistana Cewher Namiq û Serokwezirê Hukûmeta Herêma Kurdistanâ Iraqê Fû ad Mahsûm roja 12'ê Çiriya Pêşin li parlamento, li Hewlîrê li ser şerî PKK û hêzên hukûmeta Kurd civîneke hêzên Kurdistanî çebû.

Ev rêxistin û şexsên jêr di civînê de hazir bûn: Serokê Parlamento Cewher Namiq, Serokwezir Fûad Mahsûm, wezîrên hukûmeta Kurd, M. Barzanî, C. Talabanî, hin parlementer, heyeta Partiya Yekgirtina Kurdistan, bi serokatiya Mulazim Şivan, heyeta Partiya Zahmetkêşan Kurdistan, bi serokatiya Qadir Eziz, heyeta Tevgera Demokratik a Asûrî, bi serokatiya Yûnadîm Yûsif Kenna, heyeta Partiya Komunist a Iraqê, bi serokatiya Eziz Mihemed û Qadir Cebarî, nûnerê Cepha Kurdistan Iraqê û ji Kurdistanâ Rohilat (Iran) heyeta Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iranê bi serokatiya Hesen Şerîfi, heyeta Komela û heye-

ta Yekîti Şoreşgeranî Gelê Kurdistan û ji Kurdistanâ Bakur heyetîn YEKBÛN, Hevgertin-PDK, KAWA, PRNK û PKK-Vejîn.

Serokê Parlamento bi kurtî behsa rewşa Kurdistanê û tiştîn ku heta nuha hatine kirin kir û li ser mescla PKK'ê weha got: "Ji bo ku em bi PKK'ê re şer nekin ci ji destê me hat me kir. Me gelek caran ji wan daxwaz kir ku li ser hudûd nemîn û werin li mintiqêñ din karê xwe yê siyasi bimeşînin. Lî wan ev yek qebûl nekir û gotin ev gundana di dema Seddam de ji gundiyan hatine kirin û bo PKK'ê hatine dayin".

Mesûd Barzanî û Celal Talabanî jî peyivîn û behs kirin ku wan çawa alîkariya PKK'ê kirine lê PKK'ê ew xayîn ilan kirine.

Piştî wan, nûneren partiyen Kurdistanâ Bakur peyivîn. Hemûyan îlankirina dewleta federe pîroz kirin û piştigirîya xwe nîşan dan; gotin pêwîst bû ku civîneke weha berî van bûyeran hatibûna çekirin.

Wan di peyvîn xwe de gotin pêwîst e problemen di navbera hêzên Kurdistanî de bi diyalogê bêñ helkirin û şerê birakuijîyê çenebe. Endamek ji Komîta Merkezi ya YEKBÛN'ê di axaftina xwe de pêşniyara avakirina komî-teyekê kir ji bo ku di helkirina vê gelşê de bibe wasite û bi PKK'ê re li riyan diyalogê bigere. Her wisa nûnerê YEKBÛN'ê pêşniyara kir ku neşîcîn vê civînê wek raporekê ji gel re bê pêşkêş kirin. Her du pêşniyaren YEKBÛN'ê jî hatin qebûlkirin û ji bo wan du komîte hatin hilbijartin.

Komîteyek ji PDK-Î, Komela û Yekîti Şoreşgeranî Gelê Kurdistan hat çekirin ku herin bi PKK'ê re meselî bipeyivin.

Komîteya din jî ji PDK-Î, KOMELA, YEKBÛN, KAWA, Partiya Yekgirtina Kurdistan û Partiya Komunist a Iraqê hat avakirin ku raporekê li ser civînê hâzir bikin.

Protokola

Hukûmeta Herêma Kurdistanê û PKK'ê

Di roja 29. 10. 1992'an de, nûnerê PKK'ê bîrêz Osman Öcalan (Ferhad) li baregahê serokatiya Hukûmeta Herêma Kurdistanê amede bû û ragihand ku, kesên PKK'ê yên ku li erdê Kurdistan Iraqê ne, iteâtê bîryarê di 05. 10. 1992'yan de ji aliye Parlamento Netewî û Hukûmeta Herêma Kurdistanê ve hatine girtin, dikan.

Li ser vê bingehê;

1) PKK û hemû endam û ałşigirê wê teahhud dikan (soz dikan) ku, heta li ser erdê herêma Kurdistan Iraqê bin, hurmeta qanûnên li herêma Kurdistanê bigrin.

Ji bo vê bîryarê;

a) Erdê Kurdistanâ Iraqê hîç bo çalakiyên leşkerî bi kar naynin.
b) Kesên bi ser vê partiyê, ku dixwazin li Kurdistanâ Iraqê bîmîn, divê li wan navçeyen ku Hukûmeta Herêma Kurdistanê, li dûri hidûdê

Dr. Fuat Masûm

Serokwezirê Hukûmeta Herêma Kurdistanâ Iraqê

Roj Şawîs

Cigîr Serokwezirê Hukûmeta Herêma Kurdistanâ Iraqê

me li gel Tirkîyê, dest nîşan kirin, bi cih bibin.

c) Bi agahdarî û belgeya Wezareta Karê Navxwe, azadî û serbestiya hatin û çûyîna wan di herêmde, tê temîn kirin.

d) Erişen ragîhandinî li hember Hukûmeta Herêmê û Bereya Kurdistanê tê sekinandin.

2-

a) Desthilata herêmê, parêzgeriya grûba ku hevelatiyên Kurdistanâ Tirkîyê ye, ku li Kurdistanê dimîne, dike.

b) Kesên PKK'ê, tiştîn xwe (kel û pel) li cem xwe dihîlin.

c) Li herêmê azadiya kar û barê siyasi ji bo wê grûbê tê temîn kirin.

d) Desthilata herêmê, pêwîstiya tedawiya birîndaran temîn dike û her daxwazênduristî ji bo wan bi cih tîne.

30.10.1992

Li ser navê Komîta Navendî ya PKK

Osman Öcalan

Endamî Komîta Navendî ya PKK

Numan Simo

Endamî Delegasyona PKK

Civîna Muxalefeta Iraqê



Mesûd Barzanî û Celal Talabanî di civîna muxalefetê de

Kurdistanâ federe qebûl dike. Her weha Meclisê heqîn siyasi, idarî û kulturî yê kîmenete-

weyên Turkmen û Asûrî ya ji qebûl kirin.

Navêndi gundêñ ku ji aliye dewleta Tirk ve hatine valakirin

Gundêñ bi ser Dihê (Eruh)

1- Gelyê Osman, 2- Newyan, 3- Daran, 4- Tarham, 5- Milan, 6- Garisan, 7- Bana, 8- Bunguv, 9- Qesra Cello, 10- Sikoftan, 11- Çeme Gevir, 12- Mehke, 13- Emte, 14- Bingöl, 15- Çeme, 16- Gebir, 17- Sisli, 18- Gere, 19- Bingof, 20- Emte, 21- Sexturk, 22- Zeve, 23- Kaniya Biyê, 24- Geli, 25- Elaziz, 26- Yusufhan, 27- Serkari. Bê van jî ji gelek gundêñ Erûh heta nuha 200 malbatî barkiriye.

Gundêñ bi ser Perwari

28- Hot, 29- Nejec, 30- Zoravan, 31- Hol, 32- Keleh, 33- Ceman, 34- Medrese, 35- Aker, 36- Kocnis, 37- Sarıyapruk, 38- Meseh, 39- İnceler, 40- Bağlica, 41- Hestan, 42- Mexes, 43- Besta, 44- Besa, 45- Kal, 46- Kundes, 47- Omyanus, 48- Kevzin, 49- Kesrik, 50- Hoje, 51- Xirbikê Bestan, 52- Axiyan.

Gundêñ bi ser Elkehê (Betulsebab)

53- Xware Sero, 54- Kutala, 55- Gelikan, 56- Şêxbubukur, 57- Surge, 58- Gevok, 59- Hevşeb, 60- Komir, 61- Kelekok, 62- Suxurpaşa, 63- Bilbeşî, 64- Setkar, 65- Newala Genima, 66- Pirdoda, 67- Xira Beldas, 68- Hacelya, 69- Kaçete, 70- Melixa, 71- Govike, 72- Çeme Pire, 73- Hewşa Bero, 74- Bersikera, 75- Sirke, 76- Gurgavik, 77- Bordikel, 78- Pirrana, 79- Holukar, 80- Mehri, 81- Dara Hînê, 82- Terane, 83- Xenzerik, 84- Hoz, 85- Xuzirut, 86- Gundikê Siparkian, 87- Henke, 88- Himolorix, 89- Kevzanke, 90- Girê Gabelya, 91- Mirkitke, 92- Pertavine, 93- Xirtorek, 94- Gebe, 95- Şelbeke, 96- Givijokê, 97- Suxurpaşa, 98- Birman.

Gundêñ bi ser Kercosê: 99- Gundikê Kolan, 100- Acibe, 101- Çalan, 102- Zivirga Abirbinya, 103- Malmihe, 104- Beheve, 105- Derefe, 106- Bakoline, 107- Xina, 108- Zeviye Sor.

Gundêñ bi ser Cataxê

109- Turanis, 110- Kelehe, 111- Gova Hedan, 112- Ferxines, 113- Bezanis, 114- Çican, 115- Martenis, 116- Komur, 117- Kurk, 118- Deştan, 119- Bezanis, 120- Haçeros, 121- Hacibey, 122- Xwarg, 123- Turbeset, 124- Ezdinan, 125- Enines, 126- Xumar, 127- Kete, 128- Cenefe, 129- Zeferan, 130- Sul, 131- Salat, 132- Koraman, 133- Orık, 134- Konarga, 135- Mele Kelez.

Gundêñ bi ser Serti:

136- Dergalip, 137- Qesrik, 138- Geravis, 139- Dodayis, 140- Kalender, 141- Billoris, 142- Gevat,

Gundêñ bi ser Kurtalanê: 144- Beytil, 145- Kendala, 146- Kasirke,

147- Lefe, 148- Huseynî, 149- Gozik, 150- Tavlike, 151- Çemkurik.

Gundêñ bi ser Bitlisê: 152- Suwe, 153- Gomsek, 154- Herde, 155- Ingol, 156- Peremate, 157- Hevne, 158- Heveke, 159- Miryanes.

Mintiqâ Nordûzê: 160- Difne, 161- Geregir, 162- Lafena, 163- Bergana

Mintiqâ Muksê: 164- Memode, 165- Telefan, 166- Kanixumar, 167- Perz, 168- Gundo Zilan, 169- Giyanis, 170- Malesuwar, 171- Zoravan.

Gundêñ bi ser Hizanê: 172- Serik, 173- Pişta Reşan, 174- Girafidin, 175- Giyaziyyaret, 176- Cinda, 177- Aviyan.

Gundêñ bi ser Hekkariyê

178- Beyyurdur, 179- Binevşyan, 180- Göksu, 181- Dergezil, 182- Nivaner, 183- Gelyê Şüxe, 184- Suvarê Xelo, 185- Manefan, 186- Çiçekli, 187- Suvar, 188- Korta Xanê, 189- Samunan, 190- Ördekli, 191- Nergiz, 192- Taşbaşı, 193- Çanaklı, 194- Su, 195- Sulak, 196- Yüce, 197- Gelezo, 198- Girê Dîna, 199- Kitina, 200- Selmana, 201- Yayla Deresi, 202- Yukarı Pirinçken, 203- Genîş Dere, 204- Pınarlı, 205- Sarp, 206- Taşlık, 207- Degirmen, 208- Çimenli, 209- Merkez, 210- Harî, 211- İğdeli, 212- Gümüşlü, 213- Orta Dereçik, 214- Berus Kilisesi, 215- Doğanlı, 216- Gelinli, 217- Geçimli, 218- Serriya, 219- Bağlica, 220- Kost, 221- Rezok, 222- Ünlîce, 223- Kinik, 224- Kandil, 225- Karasu, 226- Güllüce, 227- Benekli, 228- Küçük Köy, 229- Sergeli, 230- Tahî, 231- Cemteg, 232- Comme, 233- Türbelli, 234- Lata, 235- Çeltik, 236- Herge, 237- Zerekli, 238- Melota, 239- Çeltepe.

Gundêñ bi ser Sîrnexê

240- Gundikê Remo, 241- Mendikeyan, 242- Kendalê, 243- Nerek,

244- Bina Bütiyan, 245- Gilindor, 246- Ustuveskur, 247- Firisan, 248- Biyasan, 249- Kurum, 250- Spindarok, 251- Siliyan, 252- Aviyan,

253- Mafîyan, 254- Hema, 255- Gezerok, 256- Dira, 257- Bakartali,

258- Gelyê Kazri, 259- Banê Cindiya, 260- Zeytûnik, 261- Dihde,

262- Mindikera, 263- Mendik, 264- Sara, 265- Xudan, 266- Destik,

267- Xaribizû, 268- Atlabil, 269- Kanî Ferşko, 270- Ziryan, 271- Berezan, 272- Benabya, 273- Gundika Remo, 274- Gundikê Osû,

275- Zifka, 276- Deriyê Kera, 277- Divin, 278- Ziyaret, 279- Xirabala, 280- Binderuk, 281- Gire Koyleri, 282- Gerne, 283- Basrit, 284- Biyava, 285- Dastel, 286- Labmeydin, 287- Guvera, 288- Avka Masiyan, 289- Cinêt, 290- Karni, 291- Basrete, 292- Sipivyan, 293- Şerefli, 294- Bezoke, 295- Gundikê Mitrib, 296- Kopanli, 297- Kavuncu, 298- Doştelalan, 299- Bane Mihenda, 300- Miştaxe, 301- Zivengok, 302- Zihê, 303- Nanif, 304- Amuryan, 305- Girêşipî, 306- Dumîlya, 307- Turkiz, 308- Rusur, 309- Sehraon, 310- Buluze Caniver, 311- Comê Mezin, 312- Ramuran, 313- Dehrabun, 314- Kurta Xanê, 315- Girok, 316- Bacrit, 317- Tengi, 318- Diryan, 319- Kola, 320- Cala, 321- Mehuki, 322- Rerenis, 323- Bicizi, 324- Sorgoza, 325- Berkêzir, 326- Bekirine, 327- Talika, 328- Şerefi, 329- Besuke, 330- Gardila, 331- Mavyan, 332- Şax. Ji bilî van gundan van gundan 100 malbatî ji ji hin gundêñ din bar kirine.

Gundêñ bi ser Silopiye

333- Girê Çolya, 334- Sarbitme, 335- Derik, 336- Şemka.

Gundêñ bi ser Mêrdinê

: 337- Kaniya Şêx,

Gundêñ bi ser Celê (Cukurca): 338- Zavite, 339- Şîfrezan,

340- Bêtkar.

RAMANÊN RAMANWERAN

Şerê PKK'ê û Pêşmergan û sebebên sebeban

Mûrad Ciwan

Suleyman Nazîfê kurê Mêhemet Seid Paşayê Diyarbekirî, sâir û edîbekî navdar ê demêndû mahîka Împaratoriya Osmanî bû û herwiha karmendekî payebilind bû, li hin wîlâyetenê Împaratoriye walîti jî kiribû.

Gava Partiya Îtihad û Terakî hat ser hukum, Suleyman Nazîf jî demekê bû waliyê Bexdayê. Suleyman Nazîf bi dijayediyâ xwe ya li hember îtihad û Terakîyê hatbû naskirin û serokên vê partiyê jî tu carî jê hez nedikirin.

Di dema walîtiya Suleyman Nazîf a Bexdayê de, li herêma Barzan serihildana Şêx Abdusselam Barzani dest pê kir. Suleyman Nazîf esker şand ser Şêx Abdusselam, lê temirandina serihildanê ne wiha hêsan bû. Gelek ês û sergêjayî ji Suleyman Nazîf re peyda kîrîn ku êdî ew ji ber van bêzîr ma.

Carekê wî di rapora xwe de ya ku ji Enwer Paşa re şiyandibû wiha gotibû: "Ev Şêx Abdusselam merivekî gelek 'eks e. Netîca serihildana wî nizanim wê çawa be. Yan ez ê wî mehû bikim, yan ew ê min mehû bike." Gava Enwer Paşa li meqamê xwe ev rapor xwend, di bin simbêlan re keniya. Wê gavê, yekî ku li wê derê bû, ji Enwer Paşa pîrsî ku ci ye, ci qewimiye. Enwer Paşa behsa çiroka Suleyman Nazîf kir û wiha got: "Ji bo min ferq nake, kî kî mehû bike, ez li karê me."

Gava xebera şerê navbera PKK'ê û pêşmergen Kurdistana Iraqê ket guhê min, hemâ raste rast ev çîrok hat bîra min.

Bi vî şerî dîrok careke din bû şahidê wê yekê ku, Kurdan ji bo gihaştina mexseda xwe riya guftûgo û lihevguhdarîkirinê nedan ber xwe, rahiştin çekîn xwe û dest bi şerekî xwînî kîrîn. Heqiqet ew e ku careke din Kurd Kurdan dikjin.

Kî zora kê bibe ew li karê ne

Helbet ne bêsebeb e. Helbet ne bêbingeh e. Lî bingeh û sebeb ci dibe bila bibe, gelo ev riya han wê bibe riya çareserkirinê? Gelô ev rê wê nexwesiya heyî siviktir bike? Gava ês û derdek hebe, dermanê ku meriv lê dike divê ês û derdê heyî jî holê rake, qet nebe siviktir bike. Eger na, ne welê be û heta derd pê girantir bibe, nexwe ew ne derman lê jahriya wê êsê ye.

Ev riya ku PKK'ê û hêzîn Kurdistana Iraqê bi vî şerî dan ber xwe, hêviya herdu aliyan jî jê ew e ku wan bigihîjîne mexseda wan. Dibe ku ji herdu aliyan yek bigî ihîje mexseda xwe jî. Lî gelo encamekî bi vî awayî ji bo mîletê Kurd wê ci bi xwe re bîne? Gelô wê daxwaza dilê Enwer Paşayen iroyîn bi cîh neyne? Xuya ye ji bo Demirel, Saddam, Hafîz û Rafsançanîyan ferq nake, kî zora kî bibe ew li karê ne.

Bî vî şerê han mîletê Kurd ji

xwe nagihîje mexseda xwe, di serde ne diyar e ku ji herdu aliyan yek jî bigihîje mexseda xwe. Rûdan nîşan didin ku her du alî ji ji vî şerî dikarin zerareke mezin bibînin. Kuşî û birîndarîn ku ji herdu aliyan çedîbin, propaganda dijminatiyê ya ku her du alî û bî taybetî jî PKK di nav gelê Kurd de li hemberî hev dikin, tehrîk û pîjîkirina ku ji her çar aliyan dîc ji dijmin tê, êris, pêşdeçûn û dagîrkîrina ordiya Türk a ku bi vê firsendê bi dest xist li ber çavan e. Ordiya Türk ne ku bes zirareke giyan da hêzîn çekdar ên PKK'ê her wiha irada gelê Kurd ê Kurdistana Iraqê jî bin pê kir, dewleta federe ya nuhavakîrî di bin postal û tank û topên Tirkan de ber bi xetera mezin a têkçûnê de diçê.

Divê em li sebebên sebeban bigerin

Çima ev şer derket? Heke meriv li sebebên iroyîn ên rojane û berbiçav bigere, meriv dikare ge-

iro rewş dijwar e, Kurd di halekî xerab de ne, heke wê piçekî jî riya bîhnvedanê û hêسابûnê li ber me veke, zû bi zû em biçin ser tespitkirina sebebên rojane yên berbiçav û wan ji holê rakin. Lî ne bes e, ne bes e. Em berê xwe bidin sebebên sebeban jî. Esas çareserkirin di vir de ye. Çimkî derd û êşa me ne bes ev şerê iroyîn e. Hemû rûdanên jiyana me ya siyasi û civakî têne di van sebebên sebeban de asê dîbin.

lekan bijmîre. Gava meriv ji terefîn şer bixwe jî bipirse, her çend giraniya siyaseta neyartî ya PKK'ê li hember hukumeta Kurdistana Iraqê û dewleta federe diyar e jî ew dikarin bi sedan sebebân li ser hev bijmîrin ku yên herdu aliyan jî wê idîanî ciddî bin ku ber bi hiş ve diçin. Lî bi baweriya min ji bo me Kurdan tespitkirina sebebên iroyîn ên rojane û berbiçav têra çareserkirina vê problemê nakan, pêdaçûnek hê dûr û kûrtir divê. Divê em li sebebên sebeban bigerin.

Gava dor were ser sebebên sebeban, ez bi xwe jî alî xwe de dikarim du xalan diyar bikim ku bi baweriya min bingehîn in. Yek jê mesela kemîlinâ mejjî an şûra milî ya kollektif e û ya din jî ya kultura demokrasiyê ye. Bûyer û rûdan nîşan didin ku li ba me Kurdan hê bi rastî mejjî û şûra mîletbûnê nekemiliye. Ci wek mîlet ci jî wek ferd me hê hemû xusûsiyeten mîletbûnê di jiyana xwe ya manewî de nebîşafîne. Hin ji wan bi me re hê peyda nebûne, hin jê jî hê nebûne aliye kî tebîyî yê jiyana me, di jiyana me de yan wek perçekî xerîb yan jî wek mîwek kal a negîhaşî xwiya dikin. Loma jî fenomena mîletbûnê, lazîmîyên wê, ci û warên nebûna wê û xeter û firsenden li ber jiyana û pêşdeçûna wê di mîjîyîn me de zelal olan nadîn. Fenomen di mîjîyîn me de di perspektifke teng û kurt û yekalî û mij û dûmanî de diçê û tê. Gavê ku em davêjin jî li gor vê ne. Ezîtiya ferdi, partîti, eşîri yan hêremî xwe dixe pêşîya menfeta hebûna milî. Rê û dirb û çareser kirinê ku em didin ber xwe, têra

hildana barê mîlet nakan, ji dêvla ku em vê rastiyê bibînin em li pey eksa xwe diçin. Gelek caran welî lê tê ku rê û dirbêne me ne ku her derdê mîlet çareser nakan, giyan û xetertir jî dikin. Di teşxisêne xwe de em dereng dimînin, di tedbîrên xwe de em ne wextnas, rewşnas û warnas in. Ne ku em di wexta lazim de diçin ser bûyer û rûdan, lê pirî caran ew me mecbûr dikin, li pey xwe dikêsin.

Kultura demokrasiyê

Mesela kultura demokrasiyê jî her bi vî awayî ye. Em Kurd ji alî hebûna kultura demokrasiyê de zêde zêde feqîr in. Di siyaseta xwe de belkî em gelek caran behsa demokrasiyê dikin, lê em negîhişti-ne wê zanebûnê ku demokrasi tiştek e ku ji siyasete gelek zêdetir e. Kultur e, jîyaneka seranser a civakî û ferdî ye. Diyardeya gîhaştin û kemîlinâ ber bi insanetiye û dûrketina ji jiyana heywanetiye ye. Pîvana xwekeşîkirin û nasîna

Çima Kurd naxwazin dewleteke wan jî hebe?

Du-sê pîrsen xalê İhsanî Silîvî hene, di her civîn û semînera ku ew tê de hazir dibe, ji kesax axfatvan dike. Pîrsen wî pîrr "basît" û kin in. Li gel vê rehetiya pîrsan jî heta nuha tu kesî bersîveke bi temamî nedaye xalê İhsan. Ü ez bawer nakim ku di vê nîvîsa xwe de ez jî kanibim bersîva wî bidimê.

Pîrsen xalê İhsan bi kurtî ev in:

-Li dînyayê çend dewlet hene? Kê ew çêkirine û çawa çêbûne? Ü çima dewleteke Kurdan tuneye?

Li hember van pîrsan, yê li hember di cî da xwe dîtertilîne, nizane ka wê bibêje ci... Loma jî xalê İhsan tim bê bersîv dimîne.

Her du pîrsen pîşî, em alaqa xwe jê nînîn, çimkî zanîneke kûr ji wan re lazim e, lê pîrsa dawî, gelo çîma hetâ nuha Kurd bindest mane û nebûne xwedî dewlet, min jî tim wek xalê İhsan meraq kîriye û xwesitiye bersîveke maqûl jê re bibînim. Di dawîya çerxa bisî de mîletekî bi 25 milyon nufusa xwe, gava hîn jî hemû mafîn xwe yên netewi û insanî bê par be, hîn nikanibe qedera xwe bi destê xwe tayîn bike ne tiştekî normal e. Muheqeq sebebek, anormaliyek heye ku dihêle em di vî hali de bimînin; hîn bindest û kole bin.

Gava ez bibêjîm pêşiyêne me nexwestine bibin dewlet ne rast e, wele ci wextê îmkân dîstîne, serî hildane, bindestî qet qebûl nekirine. Ez bibêjîm ji bo vê yekê şer nekirine, di rijandina xwîna xwe de çikosî kîrine bi carê de bêbextiye mezin e, yek bihost axa Kurdistana tuneye ku ne gorra şehîdeki be, hemû dar û berên Kurdistana bi xwîna keç û xorîn Kurd sor dikin. Bi kurtî vî mîletû ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe ji canê xwe, ji malê xwe tu tiş texsîr nekirine, her babet fedakaî kîriye, eziyet û cefâ nedîti kişandiye. Lî disa jî ji vê trajediya daimî rîzgar nebûye. È wê gavê çîma? Qey li vê dînyayê yên herî reben, herî belengaz, herî paşdemayî em in?

Bê guman pîrsâ "çîma" Kurd nebûne xwedî dewlet, hertim serê hin Kurdan meşxûl kîriye û her kes li gor xwe li bersîva vê pîrsê geriyeye. Mesela Şerefşanê Bedîlisî di Şerefnamê de vê bê tîfaqiya Kurdan bi nîfîreke Pêxember izah dike. Li gor Şerefşan; pişî ku Hezretî Mihemed, Pêxemberiya xwe ilan dike bi demekê, nav û dengê wî li dînyayê belav dibe û gelek mezin û sultanên dewletan wefdan (heyetan) dişinin ba wî, Resûltîya wî qebûl dikin. Wê demê hukumdarê Turkistana Oxuz-xan bûye; ew jî wefdeki dişine ba Pêxember. Li gor Şerefşan, serokê wefde, qehreman û zanayekî Kurd, Buxduz bûye. Buxduz merivekî pîrr gir, wek hûtekî bûye. Lî qasî girbûna xwe jî merivekî nelîhevhatî, ne xweskî bûye.

Buxduz bi wefdâ xwe ve derdikeve huzûra Pêxember. Pêxember gava vî elçiyê wek ecêbekî û ne xweskî dibîne, pîrr aciz dibe, m'adî wî ji Buxduz digere. Ji Buxduz pîrsâ qewmê wî dike. Buxduz dibêje:

-Ez Kurd im.

Li ser vê bersîva Buxduz, Pêxember nîfîreke li Kurdan dike, dibêje:

-Ya Xudayê erş û asîman! divê ev mîlet li rûyê dînyayê tu carî muwafeq nebe, tu nehîlî ku ew bi yek bibin. Heger ev mîlet yekîtiya xwe çêke wê dînyayê serobînî hev bike.

Ü helbet xwedî ji gotina Pêxemberê xwe li erdê naxe, qebûl dike. Ü ji wê rojê û vir da ye ku wek mîlet Kurd nikanin xwe bidin ser hev û bibin xwedî dewlet. Yanî musebîbê vî bindestî û perîşanîya me, Hezretî Mihemed e. Lî meriv dikane bibêje heger ji bo bindestiya mîletekî hebûna "Buxduzekî" bes bûya wê gavê divê Ereb, Farîs û Tirk tu carî nebûna xwedî dewlet. Çimkî di nav wan de jî bi hezaran "Buxduzen" wek gumgumokan hene, ne divê ew jî nuha di halê me de bûna. Lî helbet tişte Şerefşan qal dike, çîrok e. Em çîroka Şerefşan bidin alîkî. Fejet divê em qebûl bikin ku kîmasiyek, çewtiyek, anormaliyek me Kurdan heye:

Heger tunebuya wê nuha PKK li diji dewleta Kurd a Federe şer nekirî, ji bo xerakirina wê nexebitiya. Heger çewtiyek tunebuya wê iro bi hezaran Kurd ji vê siyaseta PKK'ê re li çepikan nexistana.

Heger em mîletekî kemîli bûna, wê "nûnerîn" me yên li parlamento Tirkîye, Mahmûd Uyanîk negotia: "Ji bo îlankirina dewletê divê Kurd destûrê ji Seddam bigrin.

Heger wek mîlet mîxekî me kêm buya, wê Parlamente Şîrînê Orhan Dogan negotia: "li alîkî ew -qest hukumeta Kurd e-qala yekîtiya erdê Iraqê dikin, li alîyê din jî bi îlankirina dewleta Kurd a Federal gava pêşî ya perçekirina Iraqê davêjin.

Heger em ne mîletekî bêtafîh û bextreş bûna wê Hatîp Dîcle li ser navê me nebuya parlamente û negotia: Dewleta Kurd a Federe li pêş têkoşîna şoreşger ya ku li Kurdistana Bakur û Başûr di bin serokatiya PKK'ê de berfîreh dike, bendeke emperyalîzmîye.

Heger em ne seqet bûna, wê heramzadeyek Haluk Gergerê ku hemû jiyana xwe pêşkêşî berdevkî û aqilmendiya Tirkan kîriye û carekê bi tenê jî negotiye ez Kurd im, wê nikanîba Celal Talabani û Mesûd Barzanî bi hevkariya Tirkan îthâm bikira û ji wan re bigota "câş". Ü "antî emperyalîstî" Kurd jî wê ev xeberên wî tercumeyî Kurdi nekirana û di rojnameya Welat di neweşandina...

Helbet ev ne şeleke normal e, di derekê de kîmasiyek heye... Gelo ev kîmasî ci ye? Bersîveke hazır li ba min tuneye. Lî ez dibêm heger dîstînek mîli, ruh û şûrekî mîli bi me re hebûya me yê nuha wek mîlet xwe li dora vê dewleta Kurd bikira dîwar.

Dewleta Kurd: Dê çiqas dom bike ?

Morton Abramowitz*

Hukûmeta Bush ji dil û can dixwaze ji Seddam Husêñ xilas bibe. Kurd jî dixwazin wî ji holê rakin. Belê, bi derewî be jî Washington û fedayiyêن çiya-yêن bakurê Iraqê fêrî karkirina bi hev re bûne. Lî belê di vê îttifaqê de paradoksek heye: Nuha, Seddam li ciyê xwe ye, Kurd xwedî serx-webûneca defakto (fiili) ne; bêyî wî (Seddam Husêñ H.M.) şansê serbixwebûna Kurda pir zeif e.

Cinarêñ Kurdistana defakto - Ïran, Tirkîye û heta derecekê Sûriye- jî ber tirsa xwe ya têkoşîna Kurdan, daxwaziya xwedîlerketetina petrola xwe û ji ber ne qebûlkirina sinoran dê muxalefet bikin. Serokêñ Kurd bi vê rastiyê dizanin û ji DYA'yê daxwaz û hêviyêñ wan jî hene, lê di daxwaz û hêviyêñ xwe de wek hev nafikirin. Hin ji wan ji Washingtonê, ji alîkariya ku ji serihildana kurdan (1975) ku ji alî CIA û Şahê Ïranê hatibûn teşwîqkirin û pişt re ji holê rabûbû, zêdetir alîkari dixwazin.

Hê jî piraniya Kurdan gelek optimist in. Pişti bi dehan sal mirin û wêrânburûnê, Kurd dixwazin şansê xwe yê damezrandina welatekî serbixwe bikar bînin. Û pişti tecrubeyêñ xwe yê azadiyê wê Kurd carake din qanûnêñ leşkeri yê Iraqê qebûl nekin. Ev fersenda ku di destê wan de ye hewl didin ku rastiya bi serê xwe hebûnê biafirînîn.

Kurdên Iraqê xwestin ku danûstendina xwe bi Enqerê re baş bikin da ku endîşeyêñ Tirkîye kêm bikin. Wan hilbijartineke serbest pêk anî da ku ji bo ewlekariya xwe ji Rojava (Awrûpayê H.M.) temînatan bistînîn. Di meha Tebaxa 1992'an de cara yekemîn Sekreteriyata Hukûmeta DYA bi serokêñ Kurda re- herçiqas serokêñ muxalefeta Iraqê jî bi wan re bûn- rûnişt. Lî belê ji bo Kurd qedera xwe ya dramatîk biguherînîn ji Seddam xelasbûn ne bes e. Her çiqas Seddam xwedî mîraseke barbarî jî, lê dîsa dibe ku dunya bi navê îstîqrarê berê xwe ji Kurda biguhere û wan feda bike.

Bi texmîna min tenê rejimeke sivil bi dereckeke bilind de dikare otonomiya Kurdan li dewleteke federal bi itibara "întegrîtya (masûniyeta) herêmî" qebûl bike. Lî divê Washington wê bide eş-kerekirin ku hukûmeteke sivil ku demokrasî û mafêñ insanî qebûl dike dê bête çekirin. Lî leşkerenîraqî ji bo xistina Seddam zêde îltifatî deklarasyonek wiha nakin û siyasetek

wiha jî ne mumkûn e. Û di navbera muxalefeta Iraqi de tunebûna hevkariyê, nebûna tradisyonâ demokrasiyê, plûralizmê û federalizmê dibe ku bibe sebebê bê hedefiyê.

"Iraqa azad": Divê gelê Kurd ji bo xwe bi grûbêñ Şîyan û muxalefetêñ din re xebata xwe bidomîne da ku bikarbin Iraqê yekgirtî û demokratik damezrînin, bi vê yekê jî nişan bidin ku daxwaziyeke wan a parçekirina dewletê tuneye. Li "Iraqa Azad" hukûmeteke demî wê gava pêşin be. Di eynî wextê de divê Kurdên li Iraqê ber li êrîşkarêñ Kurdên Tirkîye, PKK'ê, ku ji herêma wan êrîşen xwe didomînin, bigrin. Tu tiştekî din nikare Tirkan teskîn bike. Lî belê tiştekî ku hatin gotin serokêñ li herêmî, yêñ li Washingtonê û Kurdan bi xwe dixe nav tevliheviyekê.

Periyyodeke din a siyasi ya Emerîki derbas bû. Kijan admînistrasyona (hukûmeta) DYA dibe bila bibe, Seddam bimîne jî here jî wê bi pirsên mezintir têbikoşe. Divê DYA tewrê xwe yê di derheq statuya Xelica Faris de eşkere bike, ka amade ye ku vê statuyê xira bike yan na. Ma em dixwazin ji bo çekirina Iraqek demokratik û federal kar û barekî dûr û dirêj bikin? Gelo em cesaret dîkin ku vê amalgama (metalek e û di tijekirina qulêñ diranan de tê bikaranîn H.M.) 70 sale ku bi kolonyalîzma Brîtanî pînekirî ye, ji hev veqetînîn, perçê bikin? Yan jî emê bi paşde herin û Iraqê berî şerê Xelica Farisî bi şiklekî din lê bi diktatoriyeck ku dişibe diktatoriye kevn qebûl bikin? Yan jî teví Seddam? Rewşa herêmî stendina bîryarekê zehmet dike û mirov meyla nexwaziya tercîha qewî yan itîrafa ku ev yek hatine kîrin, hîs dike.

Di orta vê bê emniyetiyê de Kurdên Iraqê di pêşdeçûna xwe de divê bi ihtiyyat bin û daxwaziyêñ xwe berbiçav bikin. Ew li herêmeke ne dost dijin û divê ew çavêñ xwe ve-kin da ku tu kes, xelasbûna wan, bi taybetî jî ji Rojava, feda neke.

* Morton Abramowitz serokê The Carnegie Endowment for International Peace û sefirê Emerîka yê berê li Enqerê ye.

Newsweek, Îlon 21.1992, rû-pel 35

Wergêr: Hesen Mizgin

Gerrek dîrokî li nav arşîvan

Ked û Şikirdarî

-2-


Ronakbir İsaak Marogûlov kî bû, di dîroka çanda Kurdi da xizmeta wî ci bûye û çewtiya li ser navê wî bi ci rengî bûye? Em bersîva van pirsan bidin.

Sala 1933'ya meha Îlonê rojnama "Riya Teze" behsa mirina İsaak Marogûlov kir û ji bo vê babetê du rûyê rojnamê diyarı vê bûyerê kir. Gotarêñ ser Î. Marogûlov, jiyan û xizmeta wî ya bi rûmet a bona çand û tora Kurdi didan xuyakirinê.

Sala 1975'a kurê Î. Marogûlov

Kurda vekiribû, bive dersdarê zimanê Rûsi. Kuro Î. Marogûlov li ser bavê xwe dînivîse: "Li vir li Zorê fikra çekirina elîfba Kurdi li bal wî (Î. Marogûlov-C.C.) bi pêş da tê. Ji wê demê şûnda ewînek tenê karê mamostatiyê dikir, lê pêra jî li ser elîfba Kurdi ya nû kar dikir".

Pişti ku li komarêñ Pişqavqazî deわrana nû despê bû, Marogûlov idî li Ermenîstanê di meydana ronakbiriyê da kar dikir. Wî bi xurî xwe amadeyî karê çekirina elîfba Kurdi kir. "Riya Teze" dînivîse: "...Ji sala 1925'a heta roja



Isaak Marogulov

Vîktor ji Úkraynayê, bajarê Tîraspolê bi mîvandarî hatibû bajarê Yêrêvanê. Me jê hêvî kir ku jiyan û Iraqê berî şerê Xelica Farisî bi şiklekî din lê bi diktatoriyeck ku dişibe diktatoriye kevn qebûl bikin? Yan jî teví Seddam? Rewşa herêmî stendina bîryarekê zehmet dike û mirov meyla nexwaziya tercîha qewî yan itîrafa ku ev yek hatine kîrin, hîs dike.

Ji nîvîsarêñ rojnama "Riya Teze" û ya kurê wî em dibînîn, ku jiyanâ wî xoşmîri geleki dîwîlend û bi rûmet bûye.

İsaakê kurê Fehred sala 1868'a ji dayika xwe bûye. Bi eslê xwe va Aşûri ye. Bavê wî despêka sed-sala XIX'a ji ïranê koç dike tê li ser axa Ermenîstanê, ku li bin bandûra Rûsyayê bû, li wîlâyeta Êrivanê, li gundê Divînê dihê-wire. Isaak di pênc salya xwe da diya xwe wenda dike. Bav kurê xwe dide xwandinê. Di pey xilaskirina dibistanê û sêmînaryayê ya sala 1888'a re dest bi karê dersdariyê dike: Pêşiyê li gundê Şaxtaxtê (ser qeza Naxçıvanê), paşê sala 1893'a li gundê Divînê (ser qeza Qemerliyê). Î. Marogulov ji biçukiya xwe de bi başî hînî zimanê Kurdi dibe. Hêsal mala wan diçû zozanê Elegezê û bi meha ewî teví zarokê Kurd yêñ zozanvan rojêñ xwe derbas dikir.

Sala 1905'a serokatiya xwandinê ya qeza Êrivanê Î. Marogulov dişine gundê Zorê gundê Kurda (ser qeza Surmeliyê) ji bo ku li dibistana pêşine ku dewletê bona

mirina xwe (6'ê Îlûnê sala 1933'a, êvarê sehet 6'a) ew li ser elîfba û medeniyeta Kurmanca dixebeitî". Li ser riya çekirina elîfba Kurdi ew hemû karêñ ku kurdnasê berî wî di meydana çand û tora Kurdi da kiribûn, yeko- yeko dikole, hemû tekst û transkripsyonê ji bo têkstêñ Kurdi nîvîsi vedijene û hiltîne ber hesêb, da ku elîfba xwe bêqisûr ava bike. Ew yek bingeha karkirina zanyariyê ya rast bû bona mîaserkirina wê ar-mancê, ku ewî dabû ber xwe.

Î. Marogulov pişti ku elîfba Kurdi idî bi ser hevda tîne, bi nîvîsareke zanyariyê ya kûr va di kovara zanistiyê ya bi navê "çand û nîvîsandina rojhîlatê" da, (ku bi zimanê Rûsi, bi taybetî bona avakirina elîfba yêñ gelên biçük ji aliye Komîte ya li jor bi nav kîçî cap dibû) bi gotareke mezîn bi navê "Elîfba Kurdi" dide weşandin. Gava iro bi çavê zanyariyê meriv lê mîze dike meriv dibîne, ku pişti 60 salan ew nîvîsar bi kûraya xwe, bi zanyariya xwe hînî nîrxê xwe hunda nekiriye û li ser dereca bilind sekinîye. (Bêguman, hêja ye, ku ew gotar bi Kurdi, yan bi Tirkî bê belavkirinê).

Gotara Î. Marogulov ji heft paran pêk tê. Di van paran da pîrsen bingehî, ku wî lê dînihîrî, ev

Celîle Celîl



bûn: Dîroka lêkolîna ziman û elîfba Kurdi; lîteratûra li ser van pîrsan; derskirina sistêmî elîfba Lépsiüs, Kastêrn û yêñ mayîn; Zimanê Kurdi, xu-xeyseta fonetîka wî; dengen zimanê Kurdi û çetirbûna elîfba Lañî bona zimanê Kurdi û pîrînsipen bingehî yêñ ku ewî ji bo avakirina elîfba Kurdi daye ber xwe... Ev gotar wek bizmarê (mix) dawiyê bû, ku tevdîra elîfba Kurdi bi ser hev da anî. Ev elîfba wî ava kiribû, di sala 1929'a de ji hêla komîsyona taybetî ji zane û ronakbirêñ Kurd û Ermenîyan hate qebûl kîrinê. Rojnamen Ermenî, Rûsi, Azerî li ser vê bûyerê nîvîsin, lê rojnamevanan hevpeyvîna bi xwediye elîfbayê re derbaz kîrin.

Pişti ku elîfba wî ya Lañî bi dîwletî hate naskirin, Î. Marogulov bi êginî tevlî karê propagandakirina wê elîfbayê bû. Wî ji bo dersdarêñ zimanê Kurd' qursen hînkirina elîfbayê dida, çend pîrtükîn dersan nîvîsand û bi xwe li nav gundêñ Kurmanca digeriya ew hînî elîfba nû dikirin. "Riya Teze" bi şekîdarî xizmeta vî xoşmîri qîmet kîr. "Hevalê Marogulov bi elîfba ra girêdayî salen paşin dersdar bû, dersdarê zimanê Kurmancî, Ûrisî. Qura dersdarê Kurmancî ji ewlin da wî zimanê Kurmancî hîn dikir. Di Têxñikûmê da disa dersdarê zimanê Kurmancî û zimanê Ûrisî bû. Di nava salen paşin da jî wî bi zimanê Kurmancî pênc kitêb nîvîsîne".

Wek em dibînîn xîn ji vî karî ï. Marogulov keda xwe ya xuya li wê henê li meydana çand û zanya-riya Kurdi jî kîriye. "Riya Teze" dînivîse: "Hevalê Marogulov salen paşin di nava teknikuma Kurmanca da di komitîta elîfbayê teze da dixebeitî û wek xebatkarekî ulîmdar di nav seksiyona Kurmanca da li rex Înstîtûta kulturi de jî ev xebat didomand. Ew zef beyt, kilam, xeber û dereca edetê Kurmanca nîvîsiye. Heta roja paşin jî qelem di destê wî da, ew dixebeitî ji bona pêşdaçûyina elîfbayê Kurmancî, ya ku hat tesdîqkirinê sala 1929'a bi efrîdina wî".

Xizmeta ï. Marogulov vala neçû. Idî sala 1933'a li hemû gundêñ Kurdan dibistanêñ bi zimanê dê hatibûn vekirinê, dersdarêñ Kurd kar dikirin, texnîkuma Kurmanca hebû, rojnama "Riya Teze" bi serfirazî çap dibû.

Pişti mirina ï. Marogulov karêkeren Kurd yêñ meydana ronakbirîyê, rewşenbîr kom bûn û bi navê rojnama Kurdi biryar derxistin: 1. Mektebeke gundê Kurmanca bi navê ï. marogulov be. 2. Ji jîna wî ra maaş bê girêdan. 3. Destnîvîsarên wî, yêñ ku gelek salin hatine nîvîsarê û gelekî ferz in bi me, bêne neşîrkirinê. Derheq vê yekê da redaksiyon pîrsen datine pêşîya organêñ jorîn".

(Dom dike)

Deham Abdulfetah:

Yekîtiya miletan di yekîtiya zimanan re derbas dibe

Deham Abdulfetah sala 1942'an de li gundê Amûdê, Belê hatiye dinê. Xwendina xwe ya Sereta li gund, ya bekeloryayê(lise) li Hesiça teman kir. Li Uniwersita Helebê zimanê Erebî xwend. Yek ji nivîskarên Kurdistana Suriyê ye.

Hevala me Novîn Harsan li ser navê Armancê, li Şamê bi Deham Abdulfetah re rûnişt û hevpeyvîna jêrîn ji bo we xwendanan amade kir.

Armanc: Tu dikarî qala tecrûba xwe ya nivîsandinê bikî, te çewa dest pê kir û kîngê?

D. Abdulfetah: Di sala 1965-66'an de min dest bi nivîsandina Erebî kir. Kêfa min ji tote û çand re dihat. Wê demê hîn ez baş hînî nivîsandina Kurdî nebûbûm. Piştî 1977-78'an min dît ku riya min girtiye, ne riyek rast e. Min dest ji nivîsandina Erebî berda, dest bi fêrbûn û nivîsandina Kurdî kir. 5-6 salan li pey hev min xwe westand. Li Suriyê di hin kovarê piçûk de gotarin nivîsandin.

Armanc: Ü rewşa zimanê Kurdi...

D. Abdulfetah: Bi rastî pirsa te gelek fireh e. Mirov dikare li serê gelek bipeyive û bînîsîne. Ez di wê bawerîyê de me ku zimanê Kurdî yek ji wan zimanen jîndar ên cihanê ye. Lê mixabin ji vî zimanî re ne kar bûye, ne pê hatiye xebitandin û ne jî li ser hatiye rawestand. Bi vî zimanî lêkolîn nebûne. Lê çaxê mirov bingehê zimanê Kurdî bixwîne, binyata peyvan û pirsan, têkiliya wan bi hev re bibine û li ser raweste, mirov dizane têkiliyên vî zimanî hûr in û çiqasî bi hûrgîlî bi hev re hatine girêdan û têkiliya peyvan çiqasî bi hev re hebe ew, xwe didin ber rêzanekek, qaidek. Ji me her kes bi zaravê xwe yê hêrîmî yan jî bi zaravê bajarê xwe, êla xwe, herêma xwe wek ku dipeyive wisa jî tê de dixebite. Ev, aloziyekê, girêbendeyekê di riya yekîtiya zimanê Kurdî de peyda dike.

Zimanekî Kurdî yê netewî iro li meydanê nayê xebitandin. Zimanê Kurdî yê netewî li ser 3-4 zaravê sereke parve dibe. Ev zarava di tişten bingehîn de li hev dîkin. Di gelek tişten rêzimanî de jî dûrî hev in. Em nikarin wan tiştan pêk bînin an bikin yek. Jê re çareyek divê. Çaxê Kurd bikerin bibin xwedîyên biryare û bîr-yara xwe di vî tişti de bidin, bikin program û daxin dibistan û xwen-degehan, hîngê bar hêsanter dibe.

Li ser rêziman gelek kesenê Kurd xebatê hêja kirine, wek Celadet û Kamuran Bedirxan, Reşîdê Kurd, Qanatê Kurdo, Sadîq Ba-haddîn wan jî di izahê xwe de bi hawekî pirr vekirî nikanîbûne hemû tiştan ronî bikin. Belê wan

ji me re rê vekirin. Pêwest e em xebateke pirr ilmî bikin daku vî karî pêşdeür bibin...

Ez werim ser rewşa nivîskarên Kurd. Berî her tişî ez vêya bibêjîm, her pêtên zimanê Kurdî, bi hev re li ser qanûnekê hatiye ava-kirin. Ne ku hema wiha bi serê xwe ye. Binêre çiqas pirtûk çap

mam. Piştî ku ez vegeriyan Sûriyê min dît ku çar dîwanen helbestan hatine çapkiran. Di wextek wiha kurt de çar dîwan? Ewîlî ez pir kîfxwes bûm, min got Kurd pêşve diçin, berê çend şairên me hebûn iro va ye pir di-bin. Lê belê piştî ku min ew xwendin, ez gelekkî li ber ketim. Min tu qanûn û nîzam nedidît. Pêşî min xwest ez wan bibînim û ji wan re şaşıyan îzah bikim, lê min ew nedîtin. Min biryar da ku ez ji wan re bi nivîskî bêjim. Min çend pel nivîsin, min dît ku pêwîsiya hîn ferehkîrinê heye. Her çû ez di nav de çûm û kar di-rej bû. Min xwest ez bi her alî meselê bigrim ber çav. Têkiliyên herfan, yêna pêtan, şiklê şîfrê û hwd. Vî karî 3-4 salen min girt, lê dawiyê min ev pirtûka xwe çap kir. Dilê min pê ne xweş bû ku hema her weha di helbesta Kurdî

besta Kurdî bi rêke nû û li gor çaxê bidim zanîn....

Gelek helbestvanen me çêbûne, helbestan dinivîsinin. Lê wexta mirov lê dinêre gelek ji wan hîn rîza Melayê Cizîri ya hicrê ji xwe re esas digrin. Yan ji li ber eşqa Mem û Zinê rûniştine, helbest nivîsine. Ji bo çî? Çax hatiye guhertin, dinya hatiye guhertin, ma emê hîn jî wek berê bînîsîsinin. Na... Belê em milletekî bindest in, zimanê me qedexe ye, mektebên me tunene, lê dîsa ji guhertin di helbesten me de pêwest e. Min di pirtuka xwe ya dawi de xwest, vê guhertinê pêk bînim. Riye nû li gor çaxê vekim...

Yekîtiya miletan di yekîtiya zimanan re derbas dibe, ya ziman jî bi yekîtiya devokan pêk tê. Karê min ew e ku ez devoka Kurmançî bikim yek.

Ez dizanim karê min mezin e,

amadekirî hene. 1- Hindek ji Alozî û Girebendê zimanê Kurdî, 2- Kurtebêj, 3- Pes û Pêlewazên helbesten Kurdî. A pêşî 10-20 ro-jen din çap dibe, ya din ji li du hev derdikevin.


Armanc: Ditina te li ser avakîrina Komîteya Edeb a Kurd ci ye?

D. Abdulfetah: Wexta em ne bi rêkxistin bin, em bê ser û ber bin, berhemên ku derdikevin jî ewê wiha bin. Kî rabe wê bikeribe pirtûkekê çap bike, bibe helbestvan. Na ez dixwazim ku heyete tek di navbera me de hebe, ew karike her helbest û her pirtûkekê ku dike çap bibe, kontrol bike, gelo hêjâyî çapê ye an ne? Kêmasiyên wê ci ne? Û her wiha ew komîte karibe li ser ziman, helbest û nivîsaran ji 1-2 meh carekê kovarekê derxe, pêşniyaran bike. Wê çaxê pêşveçûn dîbin. Îmkan iro pir in, çapxane û hwd. Bes yekgirtin û rêkxistin tuneye. Ev yek wê li Kurdistana Iraqê pêk bê. Iro pirr tiş li wir bê rêkxistin in, lê ji iro pê ve bawer dikim wê baştir biçe.

Armanc: Mamoste, tu dizanî ci li derve û ci li hundur, gelek rojnamen Kurdî derdikevin, ji wan yek ji rojnama ARMANC e. Tu dikarî dîtina xwe li ser wê bibêji?

D. Abdulfetah: Bi rastî cihê şanaziyê ye ku gelek xort û keçen me iro li ser ziman xebatekî dîkin, pirtukan, kovaran derdixin. Lê gava ku ji aliye din meriv dinêre gelek kemasî û çewtî hene. Wek min li jor got heta ku yekbûna zaravan pêk neyê, xwiya ye ev yek ji rast nabe... Gelek caran wexta meriv li rûpelên rojnamekê dinêre meriv çend nivîsen cûda dikare bibîne. Ev kemasî ye.

Wexta ku dîtina min li ser wan bipirsin: Ezê nêrîna xwe ve-kirî bibêjîm. Daku kemasîyên heyî bêr rakirin. Bi giştî tişte ku heta nuha derdikevin, ne bi dilê min in. Swêd ew cih e yê ku bêtirîn pirtûk û rojname lê derdikevin. Lê dîsa ji li gor imkanen tişten wan ne li gor daxwaziya min in. Hinek ji wan 1-2 hejmar derketin û rawestiyen. Lê ji çend salan vir de ye, bes rojnama ARMANC nesekiniye û karê xwe kiriye. Ji 1987'an de vir ve ARMANC bi riya hin hevalan gîhiştiye destê min û min xwendîye. Ji du aliyan ve ARMANC bi karê xwe bas radibe. Yek: ARMANC li temamî aliye Kurdistanê tê belavkirin. Min nedîtiye, lê qasi ez dizanim tê vira, dice hemû deren Kurdistanê û ji layê din ve ew nivîskarê Armancê derdixin, xwendî mesûliyet in, tişten bêpîvan lê nakin. Ev jî tiştekî herî girîng e bi ya min. Ez sîpasiya wan kesan dikim û pêwest e, em tev alfakarya wan hevalan bikin.



Deham Abdulfetah: "Karê min ew e ku ez devoka Kurmançî bikim yek"

dibin. Ez dikarim bibêjîm bes li Sûrî meh tune 2-3 pirtûkên Kurdî çap nebin. Em tev bûn nivîskar, bûn şair, ma çawa bû. Mektebên Kurdî tunene hema kî radibe kîtêbekê binivîsîne, dibe. Gava ku meriv ji wan re dibêje ev ne tu berhem in, berhemê te berevkirina pûş e, gava ba rabe wê hemû ber biçin, aciz dibin, diben dilê te naxwaze. Tu rastiyê dibêjî, aciz dibin, tu nebêjî mirov di dilê xwe de aciz dibe. Te dî pirtûk derxistîne, yan ji kovareke Kurdistana Tirkî, yan jî ji yeka Iraqê girtine û li ser navê xwe çap dîkin, ev ne rast e.

Armanc: Te heta nuha sîr di-nivîsandin, lê kitêba te ya dawî li ser zimanê Kurdî ye. Gelo te dev ji sîrê berda?

D. Abdulfetah: Tu dizanî di sala 1983'yan de ez derketim derveyî welêt û heta 1987'an

de bînîzamî hebe.

Sala 1989'an de min dîwana helbestine Adonis Bûdûrîse Yu-nanî "Peyivîna bi Kurdeki re" kir Erebî. Di dîwana xwe de li ser êşa Kurda sekinibû. Min jî pêwîst dît ku wê wergerînim Erebî.

Ya duym: Piştî şewata Helepçê min helbestek bi navê "Anahîta" nivîsand. Anahîta di nav Kurda de nîşana hezkîrinê ye. Piştî têkçûna şoreşa ilona 1975'a, piştî peymana Cezayir min helbestek bi navê Tamara nivîsi. Herdu helbest jî gelek dirêj in. Min nîrîn û bawerîyên xwe ji nû ve li hember wan helbestan berçavkirin û bi navê "Li ber dergehê Laleş" tevî wergera wan a Erebî di 1990'i de çap kir. Di navbera wan de jî min pirtûk biçuk li ser rexnegiriya helbesten Kurdî derxist. Wek min li jor jî gotibû karê min ê esasî ev e: Esasî hel-

lê ez dixwazim em bilivin... Ne wek her tim, bi salan di şikeftan de, di malen xwe de rûnîn. Ji es-mana tu guhertin ji me re nayê. Celadet Bedirxan ew karê bas ne-kiriba, iro karê me zahmetir bû.

Karê min yê duduyan ew e ku ez pirtûk û rojname lê derdikevin. Lê dîsa ji li gor imkanen tişten wan ne li gor daxwaziya min in. Hinek ji wan 1-2 hejmar derketin û rawestiyen. Lê ji çend salan vir de ye, bes rojnama ARMANC nesekiniye û karê xwe kiriye. Ji 1987'an de vir ve ARMANC bi riya hin hevalan gîhiştiye destê min û min xwendîye. Ji du aliyan ve ARMANC bi karê xwe bas radibe. Yek: ARMANC li temamî aliye Kurdistanê tê belavkirin. Min nedîtiye, lê qasi ez dizanim tê vira, dice hemû deren Kurdistanê û ji layê din ve ew nivîskarê Armancê derdixin, xwendî mesûliyet in, tişten bêpîvan lê nakin. Ev jî tiştekî herî girîng e bi ya min. Ez sîpasiya wan kesan dikim û pêwest e, em tev alfakarya wan hevalan bikin.

Armanc: Nuha ji bo çapê ha-zir çend tiş li cem te hene?

D. Abdulfetah: Sê karê

Ebdurehman Mizûrî:

"Çeka helbesta serbest wênegirtin e, meydana wê agir e, müsîqa wê bilindfir e"

Ebdurehman Mizûrî di sala 1946' an de li Dihokê hâtiye dinê. Xwendina xwe ya destpêkî ú lise li vir qedanîye. Di sala 1968' an de li Bexdayê besê Fakulteya Perwerdekirinê ya Uniwersiteya Bexda xelas kiriye. Cara yekem di sala 1967' an de helbest û nivisên wî di rojname û kovarêni Kurdi de derketine.

Ji bili lêkolin û nivisên wî yê edebî ú dîrokî, heta nuha du diwanê Ebdurehman Mizûrî çap bûne;

1- Ji Evîna Çirayê Kevin

2- Li Xelkî (Xelkê) Tehlê, Li Min Şirinê

Hevalê me Hecî KARDOX li Dihokê bû mîvanê Ebdurehman Mizûrî û ji bo we xwendevanan ev hevpeyvînpê re kir.

Armanç: Tu helbesta serbest dînîstînî. Cudayıya helbesta klasik û ya serbest ci ye?

E. Mizûrî: Helbesta serbest nûkirina helbesta klasik e. Her tişt berdewam pêdivî (hewceyî) nûkirinê ye. Bûkxemilandina do, dasa durînê (çinînê) ya do, stran gotina do, ne wekî ya îro ye. Çima helbest wê her li dora xwe bizivire û cilêni xwe neguhere? Helbesta serbest ji navê wê xuya ye hemû beyarêni firînê jê re ve-kirî ne, bi rastekê (cetwel) nayê pîvan, bi davikan nayê girtin, zimanê wê 'çizivizî' ye. Çeka wê wênegirtin e, meydana wê agir e, müsîqa wê bilindfir e. Lî helbesta serbest ji serdema bapîre min Nuh û vir de her yek as û yek awaz e.

Armanç: Tevî vê ji mirov dikare bibêje ku em dikarin ji helbesta klasik feydê bigrin?

E. Mizûrî: Gelek. Ji xezîna zimanê wê, ji müsîqeyâ bilind û terr a wê, ji netîrsi û mîraniya wê ya li dijî dagîrkeran (Bo nimûne helbesten Xanî û Cigerxwîn), ji evîna wê ya agîrîn bo dilberan (bo nimûne Cizîri û Exlatî... Milletê ku ne xwediyê helbesta kevin be, wê nebe xwediyê helbesta nû jî. Rehê darberûwan nebin, pel nadîn. Çemê bê serkanî, wê bi rê de biçika. Kesê ku pişta xwe bi Birca Belek qayîm neke, wê zû li ber bayî here.

Armanç: Di nivîsandina edebî de gelek cara gala îlhamê dibe. Tu çawan helbesta dînîstî? Kengê îlham ji te re çedibe?

E. Mizûrî: Ez jî nizanim çawan birazî. Kanî jî nizane çawa ava sar dide, ewr jî nizane çawa baranê dide, Memo jî nizanîbû û nizane çawa Zînê ew dîn kir!!! Dibêjim ji îlhamê re demeke taybetî tuneye. Carna ji min zîz û sil e, carna min dide ber gezan, carna dost û berdilk e. Îlham keçekte şermîn e: dema ez bi tenê, li cem min e, destê wê li ser milê min e. Hema xelk hat, ew difire û wenda dibe!!!

Armanç: Li ser rewşa helbesta Kurdî ya li Kurdistanâ Başûr tu

dikari ci bibejî?

E. Mizûrî: Ji hemû perçen din yên Kurdistanê geşir e. Nemaze helbesta Kurdî ya nuh, helbesta Kurdî ya hevçerx. Helbestvanen me bizav dikin ku ji avasar û zelal vexwin. Zimanê helbestê nû kin, müsîqa wê bilind kin, wêneyên wê rîndtir kin. Çawa be, bizav (hereket) ji rawestiyana di cih de baştar e.


Armanç: Eger mirov rewşa çanda Kurdî ya berî serhildanê 1990 û ya îro bide ber hev, guherinek heye gelo?

E. Mizûrî: Giraniya karêncandî ta berî serhildanê li ser ziman û folklorê bû. Nivîskarêni Kurd nedîşyan li ser diroka xwe bîpeyivin, yan li ser tevgera xwe ya siyasi binivîsin. Hinek geleminen nizim bi bejna dîktator Saddam digotin. Îro, pişti serhildanê, çanda Kurdî di derya serbestiyê de avjeniyê dike. Nivîskar ci dixwaze dinivîse. Li ser siyasetê, dirokê, rewşa millet. Hetta rexne li partiyen siyasi, li dezgehan digre. Mirov nikare dîktatoriyeta Saddam û serbestiya Cebheya Kurdistanê bide ber hev. Kî dikare çavê rojê hevberî çavê şevrevînkê bike?

Armanç: Tu serokê Yekitiya Nivîskarêni Kurd li Dihokê yî. Yekitiya we kengê ava bû?

E. Mizûrî: Yekitiya Nivîskarêni Kurd civateke edebî û çandevî ye. Di sala 1970' yan de ji aliyê hinek nivîskarêni Lurds ên jîr ve ji bo xizmete ziman, edeb û folklorâ Kurdî hatiye danîn. Di çarde salan de (1970-1984) yekitiya me li Kurdistanâ Başûr di warê bicihanîna armancen xwe de roleke mezin lîstîye. Di sala 1984' an de hukûmeta Beesî Yekitiya me girt. Di şûna wê de yekitiyeke sexte hat çekirin. Dema serhildanê dest pê kir, di sala 1991'an de yekitiya sexte beravê û nivîskarêni Kurd li Şeqlawayê bi kongreyekê careke din yekitiya xwe vejandin.

Armanç: Wek, nivîskar da-xwazîn we ji parti û rîexistinên Kurd ci ne?



Ebdurehman Mizûrî: "Hinek qelemen nizim li ser bejna dîktator Saddam digotin. Îro, pişti serhildanê, çanda Kurdî di derya serbestiyê de avjeniyê dike". (Foto: Armanç)

E. Mizûrî: Herkesi daxwazek heye. Ez ê daxwaza dilê xwe bibejim. Berî her tiştî û pişti her tiştî, divê partiyen Kurdî hev bigerin. Ehmedê Xanî berî sêsed salan gotiye: "Bê hevgirtin ne dîn dimîne, ne dewlet." Evê daxwazê ji hemû partiyen Kurdistanâ mezîn dikim. Daxwaza duduyan ji partiyen Kurdistanâ başûr e. Xêra dê û babê xwe hinek ji perên ku dide sîsur û guhbel û lêbakan, hinek ji perên ku didine bi super, otomobil û Landkrozan, bila bide çapxaneyekê, pê çar helbesten Cizîri û Xanî, sê rîzîken Bidîsî û Ibin Elaşîr, du peyvîn Teremaxî û Bayezidî çap bikin.

Eger na... wê ci bêjin dirokê?

Armanç: Wek tu ji dizanî problemeke me ya alfabe û rast-nivîseke yekgirtî heye. Bi ya te di vî wart de em dikarin ci bikin?

E. Mizûrî: Bi hizra min, me rînivîseke hevgirtî heye. Ev jî rînivîsa tipen Latînî ye ku îro piraniya Kurdan pê dînîsin. Ji bili Kurdîn Kurdistanâ Bakur û ya Rojava, carna pirtükîn Kurdîn Ermenistanê yên bi van tipen jî berçav dikevin. Wek Zargotina Kurdan a Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl, Kilamîn Cimeta Kurda.

Li Kurdistanâ Başûr jî em dîxwazin bi tipen Latînî binivîsin. Lî Iraqê heta nuha rê nedaye. Di qanûnê de dibêjin ku "Li Iraqê dîvê xwendin û nivîsandina bi Kurdi, bi tipen Quranê be." Anku heta îro tipen Erebî bi darê zorê li ser me hatine ferz kirin. Lî îro pişti serhildanê nikarin tiştekî li

ser me ferz bikin.

Armanç: Gelo rajname û kovarîn bi Kurdî yên li deriveyî we-lêt derdi Kevin, wek Armanç, Berbang digîhîn desten we?

E. Mizûrî: Mixabin ku bi rîkûpêki nagîhîn me. Ji ber ku li Iraqê posteyeke serbest nebû. Me hin hejmarê wan dîtine. Xizmeteke pîroz e. Xwezî hukûmeta

Kurdistanê bikaribe dezgehîn pos-tê dane.

Armanç: Gotineke din?

E. Mizûrî: Ji bo vê hevpeyvînê sipasiya Armançê dikim. Xizmeta wê ya ji bo ziman, edeb û folklorê Kurdî pîroz dikim. Her tim serketin û pêşveçûnê jê re dixwazim.

Beşek ji helbesta ROJHEJMARA MIHRIBANA BERWARÎ

Êvariya
Gizirê gundê me têt û Gazî dike:
Qetwîrîsek bi rîka dara
Kê dîtiye?

Mehîna mîvanê malê
Ev du roj in veqetayî
Kê dîtiye?
Ho giziro!

Evro êvari gazî ke:
Dilê evê Mihrîbana jar û reben
Di binê rûbarê eşqê
Kê dîtiye?

Li Kurdîn Başûr jî em dîxwazin bi tipen Latînî binivîsin.
Lî Iraqê heta nuha rê nedaye.
Di qanûnê de dibêjin ku "Li Iraqê dîvê xwendin û nivîsandina bi Kurdi, bi tipen Quranê be." Anku heta îro tipen Erebî bi darê zorê li ser me hatine ferz kirin. Lî îro pişti serhildanê nikarin tiştekî li

SILAV

Eger tu bi rîkekê da çûyî
Te ciwanek dît
Bejna wê ya şeng û zirav ...

Gelek gelek
ji bejna terhîn çinarê,

Şîrîntir bû

Pêla porê wê yê zérîn
ji pêlén gûm û rûbara...

Bilindtir bû

Germiya herdu çavên wê
ji agîrê hizar kuçkêن
zivistanê...

Gerimtir bû

Tu b'Xudê kî,

jê nebûre

Ew perî bi rast û diristî

Warê min e

Hêlin û aqarê min e

Ne, nebûre ji wê xatûnê

Tu silavên agrînên min,

Bigehînê

Tu bigehînê.

Helbest

Tu

"ji bo Iqbal"

■ Nîzar Agirî

*Emê ci bêjin çaxa êvar xwe li pişt derî veşêre?
Çaxa ronî cilên xwe bispêre tiliyên te yên zirav?
Çaxa hêsiyê min li ser sîngâ tarîtiyê biherikin?
Wê ba hêdi hêdi derbas be qelşa canê min û fêrişteyên
nexuya wê biskêñ porê te ji ser eniya te rakin.
Wê bêdengî kenekî fireh di qada dilê min de veke.
Qîrîna rengê zer di keskesorê de.
Te j'hiz rengê zer nedikir, çavêن te bi valayiyê re şer dikirin.
Te giriye bê sedem diyarı min dikir.
Çaxa tenahî pilanan çêke?
Lêvîn te yên lerizi li ser peyalek bê laş.
Di himbêza kesereke reş û şîn de
Li ber sîka teyrekî laxir
Çaxa tu deriyêñ fixanan vekî?
Di nav reşîya umidêñ baskjêkirî de.
Emê her dû rûnin
Keziyêñ pêşerojê verişînin.*

*Şopa lingêñ te li ser rûyê havînê
Tiqtiqa kenê te li ber surra bê
Ku em bi şev derî bigrin
Nuquşka li cêniķa Xwedê bikin
Tivingekê ji tinazan tîjî arî bikin
Bi dêmêñ sert xeberan ji asmanan re bidin
Lepêñ xwe li dev û lêvîn Zeyos û Posîdyon xin.
Ku tu bi nermî, li deriyê cînarane xe.
Ku mûmek şîn di destê te de pîroz bive.
Ku tu bi awirêñ belengaz li ber banê biyaniyê binêri.
Tu çavan zelûl bikî
Wê rahêjin te
Êros û Thanatos, her yek ji aliyekî
Te bavêjin cem çiyayê Olimpê.
Ku ez her şev
Di derya bîranîna te de bifetism
Û tu here
Winda bibe.
Ezê li kur te bibînim?
Hemû Xwedêyêñ bê hempa
Wê bi şensê min bikenin
Xewnêñ min, li nav Zemûnêñ şewitî belav bibin.*

*Tu yê herî
Hêviyêñ min
Hespêñ bê hevsar li qiraxa latêñ tûj
Û Subehan
Ku tu rabî
Gulêñ ji toza hevaltiyê
Li hawîr te her û werin.
Ku em werin,
Xwe ji pira niyazan biavêjin nav lehiya
Tunebûnê.
Carek ku em di ber cihoka tîrêjêñ müşixtiyê re derbas bibin.
Ku em libêñ sozan li deşta wêraniyê belav bikin.
Tu yê, weke xûnê di damarêñ min de bilezînî.
Ku tu werî
Di hundurê hebûnê de awazêñ jiyanê li dar xîne
Ezê bazdim
Di qada dengê birûskan de
Li pey roniya çavêñ te
Ezê perrêñ kenê te bikim du bask
Û li asmanê hevalan
Her bifirim.*

Rono û sirûdêñ bêrikirinê

■ Ehmed Huseynî

Vegirtina dûkelê

Yara min... Herdem bi navê te çûkan hînî hêlinâ dilê xwe dikim. Va ji nû ve, ez û bajareki rûşustî, bi hêrseke tewş, bi saw, hevûdu digehêzînin dûkel û serhişkiya qonaxê...

Mij tîr e, sergerdan û bê armanc e, xwe di xaçerêkên zelûliya min de, li ba dike.

Gulokên berfê bi surdarî li min temaşe dikin, wekû pinpinikine çiyayî, êrişî bîranînê min dikin, maçen te û lîlava rêçan, giyanê min av didin..

Qonax mîrkuj e yarê... Evindarê te bi xaç û lerza seqemê têt himbêz kîrin.

Paytext in, ji ezîtiyê ne, ji hişê min wekû nameyekê ji şîniya sermedî, dipijîqin. Hemû istgehan sîngâ min a rût bi şûjinêñ bagerê, mist didan. Pêla kelagiriya xwedinas di berava çavê min de radiwestiya. Xuşê xuşa dengê te di derya axî-

na min de tar û mar dibû.

Evindarê te ye... yê xaka pir westiyayî ye...

Yê tevzinokên serdemâ kevirini ye...

Dilê wî mina libek genim, di xêzên dûrbûna te de, di cokên bêrikirina te de, şîn têt...

Tina wî bi şîrê mirinê naşikê, wekû keserekê, dara jiyanê xwe pê dide naskirin.

Evindarê te piço piço bûye. Revend e, bi kefeneke koceran hatiye pêçan,

Eger hat û serê xwe danî ser bişkojêñ xewna te, eger hat û di nav rewrewka porê te de xulmaş bû, bi nimebaran û keservedana welêt, vediciniqe... Xwe û rûpelên dîroka xwe, dadiqurtine...

...Bîna şewatê ya ji canê wî difûre, ji dûkelê vegirtiye / WELATO... bîrêveçûna te ji maka evinê dest pê dike. Sinorêñ te di

dilkê dil de, şemal şemal, zil didin. Her û her dê can û laş bi nûçeyan hebûna te, bêne herifandin...

RONO... Siberâ te di xwîna min de ye... stirana çiyan ya ku di lêvîn te de hatiye bişafatîn, wekû FERATEKİ sazbend, di bir û bîra min de, sirûdan diafirine.

Têbinî

Min nîzanibû bû ku ezê ewqasî bêriya goristana bajêr bikim.

Eger roja pêşemê tu çuyî serdana dayika min, kêsrekêñ li dora gorê bigvêşê, da ku nalina min bête vejandin.

Dema tu ji goristanê vegerryayî, tu yê riya xwe bi kolana me xînî, li ser dergehê hewşê çavê min daliqandî ne, wan maç ke ta ku zuha nebin.. tika dikim.

HİSYARBİN

Ev nîvisa jêrin ji ali M. Salih Bedirxan ve, di kovara Rojî Kurd (no:2/1913) de hatiye belavîn. M. Salih Bedirxan biraziyê Bedirxan Beg û bayê Rewşen Bedirxan e. Wî bi xwe di gelek rojname û kovarêñ Kurdan yên wê

demê de gelek nîvisen cur bi cu-rêñ bi Kurdi û Tirkî nîvisiye. Wî di nîvisen xwe de gelek navêñ cihê ji bi kar anîye, mesela, wek M. Salih Bedirxan, Ebû Rewşen, Muncî Kurdi, M. S. Azîzî.

M. Salih Bedirxan di 1854'an

de ji diya xwe bûye, di 1915'an de jî mirîye.

Ev nîvisa wî ya jêrin me ji bo xwendevanan ji herfîn erebî wer-gerand herfîn latîni.

M. Lewendî

M. S. Azîzî

Birayê me Kurda re hisyarbin divê. Heke ji paş niho jî em çavê xwe venekin û ji wê xewa giran hisyar nebin, ji me re Kurdaniya me nahêlin û ên me ji nav holê bavêjin. Divê em qenc bizanin ku iro halê me weke nexwêş li ber sekratê ye. Dost çav bi girî ye, dujmin rû bi ken. Li vir min go dost, nebêjin me ji me xwe pê ve dost heye. Heçî ji me piçek heşê wî li serê wî ye û piçek zana ye, ew vî halî dibîne, aqîbeta me re diltirs dibe û melûl e. An hemî dinya rû bi ken û baxûsûs heçî ku çav li mîrasa me kirî, ew yekcar bi şâ ye, bi kîf e.


Edî divê em hemî... zanayê me û nezanayê me hemî çavê xwe vekin û dest bidin hev û ji selametiya Kurdaniyê re bixebeitin. Welatî ji tahlukeyê xelas bikin. Namûş û şerefa xwe bilind bikin, da ji wê pê ve em li ber dost û dijmina serê xwe bilind kin.

İro ji şes milyona bêtir Kurd hene, weke Kurda mîrxas tune, xweyî nav û deng in, li ku bin, bi mîraniya xwe xuya dikin. Lî sed heyfa min li Kurdaniyê be, li nav qewma de nav wan nayê gotin, ji Kurdeki re çığa şermî dibe weki navê enasira têt, kes nabêjît Kurd ji hene. Çunki Kurd ne xweyî ilm

û marîfetê ne, êdî işe dinê û siyasetê nîzanin, ne xweyî mewcûdiyete tekî xurt in. Ji wê yekê re kes jî wan nas nakit.

İro tarîxek Kurda tuneye. Kurd nîzanin berî niha xweyî ci bîn. Ji newêñ xwe re, ji İslamiyê re ci xizmet kirine. İro xezetek Kurda nîne, nikarin xwe ji tadeya, ji hile û desisiyê siyasetê xwe muhafize bikin. Xwendin û nîvisandina Kurmancî nîne. Heta niho kesekî kitêbek serf û nehwê tedwîn nekiriye. İro tu qewm ne-maye ku her yek ne xweyî pazde babet cerîda be. Bi van cerîdan halê xwe beyan dikin. Derdê xwe tesrîh dikin. Mutellebek wan hebe, dixwazin. Cerîde ye ji her qewmî re dibe şûna 'ezmanî. Heçî qewmî bê cerîde ye, ew mirovek lal e, nedikare derdê xwe bêje û ne jî seh dike hal û mewqiyê xwe ci ye.

Ev e, li hêrê xortên Kurmanca xwe dan hev, cemiyetek Kurda çêkirin. Navê cemiyetê Hêvî danîne. Niho jî bi dest cerîde kîrine, ev cerîda he ji ilm û marîfetê behs dike, ji tiştekî dî nikare behs bike. Çimkî qanûna dewletê de madeyek heye, dibêje; heçî ku



Salih Bedirxan

cerîdeya siyasi derxe, divê pêncsed zêra emanet danîne. Heçî ku Kurd in, aciz in ji tedarîka van pera. Ji wê êkê re niho bi vê cerîdeya Rojî Kurd kitifa kirine.

Heke xwendê hez ke û birayê me Kurda çav vekir xwe dît li ci mewqî ye hingî ewê xwe bi xwe bixebeitin da cerîdeyekî derfîn ku halê wan tesrîh bike û alem û medeniyetê bide zanîn ku li dinê Kurd hene. Niho rica me ji birayê me Kurda ew e, hema hisyar bîn û xwe bigehînin mewqiyekî lê bîkaribin siyana xwe muhefeze bikin.

Beyana Îlankirina Kurdistana Federe

Di dawiya şerî yekem ê cihanî de hêviya gelê Kurd ew bû ku wek neteweyên din yên li jêr destê Osmaniyan, ew ji bibin xwedî desthilat û dewletteke wan ji ava bibe. Lê hêzên di şer de biserketî ku kîfta çareserkirinê di destê wan de bû, ji ber berjewendiyê xwe yên piralî, mafê rewa yê serbixwebûna vî neteweyê kevnar nas nekirin. Tevî protesto û serhildanê vî gelê mezlûm û tevî benden 62 û 64 ji birê 7. em ya Peymana Sevr ya 10'ê Tebaxa 1920 ku li seranseri Kurdistanê danîna dewletteke serbixwe dipejirand û rî dida gelê Kurdistana başûr ji tevlî vê yekityê bibe, Kurdistan di nav 5 dewletan de hat par kirin. Di 23'ê Tîrmeha 1923' an de bi Peymana Lozanê hêviyên ku hebûn, tev li ber bê çûn. Di rapora Komîteya Koma Miletan de -rûpel 57- hatibû gotin ku Kurd dikarin dewletteke serbixwe çêkin, ji ber ku ew ji 8/5 ê nifusa li deverê pêk tînin. Wilayeta Müsil, tevî komîteya ku ji aliyê Koma Milletan ve hatibû avakirin, di 16'ê Çileya Pêşin a 1925'an, civîna 37. em de bi ser Iraqê hat ilhaqkirin. Bi vî awayî Koma Miletan piştigiriya xwe bi tenê ji bo bîdestixista mafê idarî, dadgehî û avakirina dezgehê zimanî yên Kurdish, bi sînor kir.

Tevî şoreşa gelê Kurd a di bin serokatiya Şêx Mehmedê nemir, û cara yekem di 1919' an, cara duyem ji di 1922' an de nasîna hukumdarîya wî ji aliyê Britanya ve, ev perçê Kurdistanê bêyi xwes-tin û iradeya gelê Kurd û bi darê zorê ilhaqî dewleta Iraqê bû. Çaxê hukûmeta Ingiliz, hukûmeta Iraqê da nasîn, (ku li jêr nîrê Ingilîzan bû) ji bona dilxweskirina Kurdish, her du hukûmetan bi beyaneke müsterek soz dan gotin di nav sînorê Iraqê de wê mafê Kurdish yê danîna hukûmetaka Kurdî hebe. Soza her du hukûmetan ya ku maf dida Kurdish ku di nav xwe de li ser avahîya hukûmetê û li ser sînoran li hev bikin û heyeteke xwedî sel-ehiyatên temam ji bona danûstandinê ekonomik û politik bi hukûmeta Qraliya Ingilîz û ya Iraqê re bikin, bişînin Bexdayê, wek hubura li ser kaxezê ma.

Di 3'ê Çiriya Pêşin a 1932' an de endametiya Iraqê ji bo Koma Miletan, bi bicihanîna şertê Koma Miletan ve hat girêdan. Ev şert ew 16 bend bûn yên ku hukûmeta Iraqê di 30'ê Gulana 1932' an de wek belge ilan kiribûn. Li gor van şertan, diviyabû Iraqê siyaneta mafê insanî, kulturî û idarî yên Kurdish û kîmeneteweyan bigirta. Ev belge li gor huquq û qanûnên navnetewî iro ji derbas dibe. Piştî lexûkirina Koma Miletan, di 18'ê Nîsan 1946' an de bi benda 16.em ev selehiyat ketin destê Neteweyen Yekgirtî. Li gor vê belgeye, Iraq bi serî xwe nikare bendê vê biryara biguherîne, yan li dij derkeve. Bi tenê bi piraniya dengen Koma Miletan û erêkirina Dîwana Edale-tê ya Navnetewî derbirîna (yorum) bendar tê ki-rin. Kamilî û serbixwebûna Iraqê bi bicihanîna bendê vê belgeye ve girêdayî bû. Lê hukûmeta Iraqê bi eşkere pê li van bendar kir û ev yek bi biryara Konseya Ewlehiyê ya Neteweyen Yekgirtî ya bi tarîx 5 Nîsan 1991 û reqem 688 û biryara Komîteya Mafê Mirovî (Konseya Ekonomik û Sosyal) ya Neteweyen Yekgirtî ya bi tarîx 5 Adar 1992 û reqem 71/1992 hat tesbîtkirin.

Dîroka gelê Kurd a li Iraqê pir e ji serhildan û şoreşan. Piştî ku hukûmeta Ebdulkerim Qasim piştî xwe da sozên xwe û benda 3'em ya qanûna bingehîn a şoresa 14'ê Tîrmeha 1958' an, ku digot Kurd û Ereb li Iraqê müsterek in, ji nav rakir, di 11'ê Ilona 1961' an de gelê Kurd di bin serokatiya Barzaniyê nemir de careke din dest avêt çek. Bi serketina vê şoreşê û peymana 11'ê Adara 1970' an mafê otonomiya gelê Kurd ket qanûna bingehîn. Lê hukûmeta Iraqê guhê xwe neda vê peymânê ji.

Di sala 1975' an de Saddam Huseyîn beşek ji erdê Iraqê firot û piştî peymana Cezayîrê têkoşin bo demeke muweqet şikest, lê gelê Kurd xebata xwe domand û bo hemû cihanî îsbat kir ku na-mire.

Di qanûnên NY de hatiye gotin, nabe ku asteng li pêş bikaranîna mafê bingehîn yên mirovan bîn danîn; maf û umîniteta şexsan parastî ye,

jin, peya û biçük yan mezin tev netewe wekhev in. Dîsa di benda 6' em ya beşê 1' em de (siyaneta ji bo peywendiyê wekhev yên di navbera netewyan de, wekheviya gelan û mafê bi destê xwe çarenivîsa xwe nivîsin ji bo her gelekî) her du tif-aqên navnetewî yên ku mafê çarenivîsa gelan dide wan bixwe (mafê ekonomî, kulturî, civakî û mafê dînî û siyasi) û NY di sala 1966' an de belav kiriye û Iraqê di 25'ê Çiriya Paşin a 1971' an de imze avetiye binî, diyar dike ku mafê diyarkirina otoriteya siyasi û qedera gelan di destê wan bi xwe de ye.

Lê ji avakirina xwe (1921) heta iro şela hukûmeten Iraqê ya li hember gelê Kurd bi tenê zordarî, perçîqandin, nefikirin; ji mafê herf besit yên insanî, kulturî, civakî û aborî bêpar hiştin; ji mafê siyasi û jiyanê bêpar hiştin, bûye. Vê zordariyê mirov, heyan û zireeta Kurdistanê ji daye ber xwe. Hukûmeta Iraqê êrişen dirindane yên binaxkirina gelê me bi hovîti domandine:

1- Rewşa 8000 Barzaniyên ku di sala 1983' an de hatin girtin û heta iro bê ser û sün in.

2- Di navbera salên 1970-1988' an de girtin û windakirina 7500 Kurdish, nefikirina 300.000 Kûrdîn Feyli ji Iraqê.

3- Di sala 1988' an de li Helebçeyê bi çekên kîmyayî qetla 5000 ciwan, pîr û zarokan. Li Balisanê û li deverên din yên Kurdistanê kuştina bêhemjar Kurdish.

4- 'Tevgera Enfal' ya hov ku bû sebebê birçîbûn, işkence, tecawiz û biaxkirina bi tevayı.

5- Wêrankirina 4500 gundan (Ku ev hejmar % 95 û gundan Kurdistanê ye.), qetla Asûrî, Turman û kîmeneteweyen din, li gor qanûnên navnetewî súcen şer û insanî.

Tevî van kirinan ji, cihan heyameke dirêj bê-deng ma. Lê piştî serhildana 1991' an, dîmenên rev û mişextan camên televizyonen wan xemilandin û nema karîn vê sosretê ji gelên xwe veşerîn. Bi vî awayî piştî Peymana Sevr, cara duyem peyva adil ji devê cihanî derket û biryara 688 ya Konseya Ewlehiyê derket. Ev biryar li ser berlê-girtina zordariya li ser Kurdish, peydakirina herêma ewlehiyê û soza parastina jiyanâ Kurdish bû.

Gelê me di ser jan û qetliam û kuştinan ji, tim û tim ji bo çareserkirina pîsî niyeta xwe ya bas pêşkêş kiriye. Guftûgoyen sala 1963, beyana 29'ê Xizîra 1966' an, guftûgoyen sala 1984' an û ji bo lihevhatinê hewildanê bêbir. Lê hertim xiyanet bûye bersiva van hewildanê aştiyane. Ü heri dawî ji hukûmeta Iraqê ji sozên xwe yên di guftûgoyen sala 1991' an de vegeryan, idareya xwe ji Kurdistanê kîşandin û ambargoya aborî li ser me şidandin. Vê rewşê Cebheya Kurdistanê wek emriwaqî kir rîevebera deverê ku bi biryara Cebhe di 19'ê Gulana 1992' an de hilbijartînê azad li dar xistin. Gelê me bi serbestî, li erdê riz-girkirî yê Kurdistanê endamên Meclisa Netewî ya Kurdistanê hilbijartîn û di 5'ê Tîrmeha 1992' an de yekem hukûmeta Kurdistanê piştî baweriya Meclisî dest bi wezîfeya xwe kir. Li gor rîza duyem a benda 56. em ya Qanûna Meclisa Netewî ya Kurdistana Iraqê (1991/1) wezîfeya Meclisî; Destnîşankirina hevgirtin û pirsgirêkên gelê Kurdistana Iraqê. Parastina biratiya dîrokî ya Kurd û Ereban, parastina yekîtiya netewî ya Iraqê û li gor biryaren opozisyonâ Iraqê yên li Viyana û li Kurdistana Iraqê, (Ev biryar li gor berjewendiyê pişkarî yê gelên Kurd û Ereb; diyarkirina mafê çarenivîsa gelê Kurd bi destê xwe bi xwe, di qanûna bingehîn de garantikirina mafê idarî, kulturî û netewî yên Asûrî û Turkmenan e.) Meclisa Kurdistana Iraqê, bi hemû dengan li ser navê gelê Kurdistana Iraqê biryar daye ku di vê qonaxa dîrokî de mafê çarenivîsa xwe li gor peymanê navnetewî, li ser bingeha siyaneta ji bo mafê mirov û sîstema demokratik ya pir partîti di çerçewa Yekîtiya Federal de danûstandinan bi hukûmeta merkezi re bike.

Meclisa Netewî ya Kurdistana Iraqê
Hewlîr 4.10.1992

Weşanênu Nuh

Amadekar: Rohat

Ağrı Dağı İsyani (Serhildana
Çiyayê Girîdaxê), İhsan Nûrî Paşa, Weşanxana Med, 103 rûpel, İstanbul, 1992.

Di vê pirtûkê de bîranînen serokê Serhildana Çiyayê Girîdaxê, İhsan Nûrî Paşa, cih girtine. Cara pêşin ev bîranîn di kovara Hêvî de li Parisê bes-beş bi Kurdi hatibûn çap kiri. Di hejmarên 2-6' an de (1984-1987) wek pênc beşan hatibûn weşandin. Paşê komeleke Kurd bi navê HEVKOM (li Avusturya) ev bîranî-nan wergerandiye Tirkî. Ev çapa nû ku cara pêşin li Tirkîye tê weşandin angorî vê wergera Awusturya hatiye amadekirin.




Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna (Ji Alayen Hemîdîyê - Heta Milisiya Gundan), Osman Aytar, Weşanê Medya Gunesi, 387 rûpel, Stenbol, 1992.

Ev lêkolîn ji du beşan pêk tê. Di beş yekemîn de nivîskar li ser dîroka Alayen Hemîdîyan disekine, avakirin û têkçûna van alayan dide nasîn. Di beşê duwemîn de ji, nivîskar sîstema milîsiya gundan tahlîl dike, di navbera alayen Hemîdîyan û vê sîstêmê de tu cudatîkê nabîne. Wek tê zanîn ev sîstema Milîsiya Gundan piştî sala 1985' an li Tirkîye li dijî tevgeren Kurdish bi destê dewlettê hatiye sazkin, kesen ku bûne milîs ji hemû Kurd in. Di dawiya pirtûkê de navên çend çavkaniyê bi kîrhatî ji cih girtine.

İttihat-Terakkî ve Kürtler (Rêxistina YEKBÛN-Pêşketinê û Kurd), Naci Kutlay, 354 rûpel, Weşanxana Beybûn, Enqere, 1992.

Rêxistina YEKBÛN- Pêşketinê (İttihat-Terakkî) wek tê zanîn di deshpêka sed-sala me de hatiye saz kiri û piştî avakirina xwe bi temamî ketiye destê dorberen Tirk. Naci Kutlay di vê lêkolîna xwe de bi taybetî pêwendiyen vê rêxistinê û Kurdish tahlîl dike, di nav van salan de rewşa tevgeren Kurdish raçav dike. Çapa yekemîn ya vê lêkolînê cara pêşin li Stockholm (1990), çapa duwemîn li Tirkîye derket (1991). Ev çapa sîyemîn û nuh ji aliyê nivîskar ve hatiye firehkîrin. Di dawiya pirtûkê de çend wêneyen ku di çapen kevin de tunebûn cih girtine.




Kalemimden Sayfalar (Ji Pênuşa Min Çend Rûpel), Necmettin Büyükkaya, Weşanxana APEC-TRYCK, 504 rûpel, Stockholm, 1992.

Necmettin Büyükkaya (1943-1984) welatparêzeki Kurdê Kurdistana Bakur e. Ev welatparêzê Kurd wek tê zanîn di sala 1984' an de li girtîgeha Diyarbekirê bi destê leşkeren Tirk hat kuştin. Birayê wî Şerwan Büyükkaya di vê pirtûka nuh de gelek name, not, gotar û bîranînen Necmettin Büyükkaya berev kirine û wek pirtûk derxistiye. Di nav rûpelên pirtûkê de çend wêneyen Necmettin Büyükkaya ji hene. Di dawiya vê xebatê de ferhen-geke Zazakî-Tirkî û nivîsen ku li ser wî di çapemeniya Kurdi de derketine, cih girtine.

Bir Kadın Uyanıyor (Jinek Hisyar Dibe), Zelal Bozarslan, Weşanxana Dîlan, 77 rûpel, Diyarbekir, 1992.

Di vê pirtûkê de deh kurteçirokên Zelal Bozarslan cih girtine. Di nav rûpelên pêşin de pêşgotineke nivîskarê heye, tê da li ser hê-jahiya jîyinê û mirovan tê sekînîn. Ji ber ve yekê ji, ji xwendevanan tika (rîca) dike ku, ew bi çavekî din (ne tenê bi rexneyen edebî) nêzîkî bûyeran bibin. Di dawiya pirtûkê de helbesteke bi navê Kutsal Sevgili (Evindarê Mukades) hatiye weşandin. Nivîskara pirtûkê di nav kurteçirokên xwe de zêdetir rewşa jinan daye ber çavan.



Serê PKK'ê û Pêşmergan...

pişî ku müşkuş gîhaşt vê qonaxê bêyî ku dûr û dirê encaman bifikire, fan û futen dijmin li ber çavân bigire, bi hêsanî êris bir ser hêzên PKK'ê. Welê lê hat ku gava 20 hezar leşkeren Tirk tecawuzî axa rizgarkirî kirin, mecbûr ma hustuyê xwe li ber wan xwar bike, ji bîfî derxistina dengekî kîz ê nerazibûnê nikare zede tîstekî din bike. Gelo berî ku rewş were vê noxtê, riyeke din ji bo çareserkirinê tu-nebû?

Bûyerên wek van her du mîsalan hatine serê hêzên me yên din ji. Xuya ye hustûxwarkirin û serîwendîna li

hember biyanî an dijminan bi me gelik tebîî ye, lê qebûlkirin û naşîna heq û huquqê hevûdin naakeve bîra me. Roja ku erdê Kurdistanâ Iraqê rizgar bû, PKK'ê rastî û heq û huquqê Kurden Kurdistanâ Iraqê û hêzên wan qebûl û hezim bikira, hêzên Kurdistanâ Iraqê ji mehnâ hebûna serê çekdarî yê PKK'ê li ber çav bigirtana, yanî Kurdan ihmîm dabûna hev û bi vê iñtimamê nêzî hevdu bibûna, rewş nedîhat vê noxtê. Ev mîsalen han ên trajîk him bi mesela kemîlîna şûra milebûnê him ji bi mesela hebûn û hebûna kultura demokrasiyê ne. Yanî

bi mesela sebebên sebeban ve girê dayî ye. Ez nabêjim em li ser sebebân ranewestin. Na, iro rewş dijwar e, Kurd di halekî xerab de ne, heke wê piçekî ji nya bîhîrvedanê hêşabûnê li ber me veke, zû bi zû em biçin ser tespitkirina sebebên rojane yên berbiçav û wan ji holê rakin. Lî ne bes e, ne bes e. Em berî xwe bidin sebebên sebebân ji. Esas çareserkirin di vir de ye. Çimkî derd û êşa me ne bes ev şerî troyin e. Hemû rûdanen jiyana me ya siyasi û cîvakî tên di van sebebên sebebân de ase dibin.

Dijayetiyyê rojane û...

avêtiye ser Şîrnexê", nebû "sîxurî" lê me got Ozgur Gundem û A. Ocalan, ber-pîsiyârê PKK'ê yê Ewrûpa gotine "PKK avêtiye ser Şîrnexê" dice "sîxurî"!!!

Armancê ci kir? Ji seri heta binê nûçeyê, êrişâ dewleta Tirk sîccdar kir, nalet lêbarandin û bi paragrafekê ji beyanên PKK'ê yên ne wek hev rexne kir.

PKK'ê tam 5 rojan pişî bûyerê got "ne em in", berî

wê got em in. Ev bû sedem ku Kurd bi derengî provakasyona dewletê desifre bikin. Ev bû sedem ku dewletê Ewrûpî, rîexistinê humanîter li hember vê bûyera dirindane dengê xwe bilind nekin. Dema Armanc vê yekê rexne bike, dibe "sîxurî", lê dema ku tu van nebûnî yan çavên xwe jê re bigî, tu dibî têkoşer.


Nuha li welêt terorek fîli hey. Lî hinek bi

sûcdariyê "sîxurî" û bi tehdîdên "bersîvdayinê" diwxazin terora fîkrî ji binin holê, ku anîne ji. Ev yek ji bo mîletekî mirin e. Em wek têkoşerên mîletê Kurd vê yekê qebûl nakin. Wek şexis ez pirr pê êşiyam ku van gotinan dî devê te de ji olan dane.

Ez hêvîdar im dema ku tu li van rastiyen biwerqîli, ne pir dereng be.

Xacepîrs

Amadekar: S. Rêving



ÇEPEAST: 1-a- Paytextê dewleta federal a Kurdistanâ Iraqê. b- Na, no (berevajî) c- İş, şuxul 2-a- Di Kurmancî de veqetandek b- Ji navê kuran (berevajî) c- Dawarek 3-a- Zivistanan mirov dara, komîrê dixe nav, pê dixe û odayan bi germiya wê germ dike. (berevajî) b- Rêzan, serok. 4-a- Jina Elişêrê ji serokên şoresha Koçgiri.

b- Li Rusyayê çemek. 5-a- Ji hêkên beq û masiyan re tê gotin. b- Kesê ne ji vî welatî, biyanî. 6-a- Hevdî, yekudu. b- Paşdaçekek. c- Xanî. 7-a- Erd (berevajî) b- Navê hukûmdarê elmanî ku wiliyatîn elman tev gîhandin hev. 8-a- Baneşanek b- Du herfîn dengdar. c- Paşdaçekek. 9-a- Qayışen pantoran yên ku di

ser milan re derbas dikin ji bona ku kembera pantor danekeve xwarê (berevajî) 10-a- Serokê rîexistina "Azadi" ya ku di salen 1920'an de li Kurdistanâ bakur hatîbû damezirandin. (berevajî) 11-a- Kesê ku ne peya ye, ne jin e. b- dîn. 12-a- Kevir, kuç b- Çemek di navbera Kurdistan û Ermenistanê de. c- Di Kurmancî de pronavekî sîfetan.

Bersîva hejmara berê

Çepeast: 1-a- dewlemend, b)law. 2-a- îsa, b)wêranî. 3-a-na, b)Remezan. 4-a-ar, b)fuar, c)br. 5-a)rûbar, b)mezra. 6-a)Aras, b)kadîn. 7-a)Salo. 8-a)kurt, b)sor, c)aza. 9-a)mışar, b)av. 10-a)rî, b)penaber. 11-a)terş, b)qaz, c)te. 12-a)kêr, b)sal.

Serejêr: 1-Diyarnekir. 2-a)es, b)rû, c)isk. 3-a)Wan, b)Basra, c)re. 4-a)Ararat, b)per. 5-a)ew, b)Aral, c)met. 6-a)mérû, b)sosin. 7-a)erefa, b)qaşo. 8-a)nam, b)rk, c)Gabar. 9-a)sazbend, b)rez. 10-a)derzi. 11-a)Mîrza, b)ta. 12-a)Wanî, b)Avdel.

Dewleta Kurd ...

Başûrê Kurdistanê ji me giraniya xwe daye ser têkoşîna serxwebûn û azadiyê. Bi pêşengiya PAK'ê iro li wir ji, li hember cepheyeke serxwebûn û azadiyê heye".

Sêla dewletê kolonyalist

Îlankirina Kurdistanâ Federe ji dînyayê bêtir, li dewletê "cînar" olan da. Dewlefeñ mezin; Amerika, Îngîlîstan, Fransa, Almanya bê deng man. Bêdengmayina wan, ji aliyê hin berdevkîn dewletê dagirker û çavdîrê bêalî, wek alîkarî û pişgirîye biryara Meclîsa Netewî hat şirovekirin. Lî dewletê ku Kurdistan percekirine bi

beyan, tevger, û şela xwe didin diyarkirin ku ji vê bîryarê pirr ne xweş in. Iraq, wek ku Meclîsa Kurdistanê nas nake, da diyarkirin ku ew vê bîryarê ji nas na. Seddam serokê Meclîsê şand Anquerê û bi şeklekî vekirî da gotin "ev gava Kurdish avêtiye wê ber bi serxwebûnê here û dema serbixwe bibin ji ewê doza erd li Tirkîyê ji bikin.

Hukumeta Tirkîyê roja 8'ê Çiriya Pêşin, xususî ji bo vê bîryarê civiya. Di dawiya civîna xwe de belavokek derxist. Di vê belavokê de şela xwe weha da diyarkirin:

"Bîryara dewleta federe yek alî hatîye girtin û em wisa dibînin ku ev gav dikare Iraqla ber bi perçebûnê

ve bibe. Wek berê iro ji em gaveke weha, di cî da nabînin." Li gor hukûmeta Tirk, dewleta îlankirina Kurdistan wê li aşîtî û aramiya herêmê bi şiklekî nebaş tesîr bike, loma ji "xêra vê bûyerê ne ji gelê Kurd re û ne ji herêmê re heye".

Li aliyê din Iran ji ne razîbûna xwe li hember bîryara Meclîsa Netewî ya Kurdistanê da diyarkirin.

Bi însiyatîfa Tirkîyê wezîrên derve yên Tirkîyê, Iranê, Suriyê û Suudi Arabistanê di 14 û 15'ê meha Çiriya Paşîn de wê li Anquerê bicivin. Rojeva civînê musteqbela Iraqê û dewleta Kurd a federe ye

M. Bextiyar

Ordiya Romê, dewleta...

Heger PKK şenîn me qebûl neke, Dewleta Federal wê li gor qanûnên xwe gelşê çareser bike."

Her weha di civîna hêzên Kurdistanî de ku di 14.10.1992'an de li Hewlêrê çêbû, Cewher Namiq, serokê Meclîsa Netewî ya Kurdistanê û Dr. Fuad Mehsum serokwezîrê hukûmeta Kurdistanê got ku PKK'ê dest daniye li ser 350 gundîn li ser sînor û dibêje ev gund ji aliyê Seddam ve ji gundiyan hatîne kirin û Seddam ji dane me. Em jê dernakevin."

Li gor beyanên PKK ji "imperializm ji bo pêşîlîgirtina PKK û têkoşîna PKK'ê dixwaze li Kurdistanâ Iraqê modeleke kirêgirtî bi pêş xe. Ji bo vê ji biriya nûkeren xwe Celal Talabanî û Mesud Barzanî hilbijartinan li dar dixin, mîclis û hukûmet û dawiyê ji dewletekê çedîkin. Dixwazin li hember xetê serxwebûnê, xetê koletiyê li Kurdistanâ başûn bi pêş de binin û vê modelê veguhêzin Kurdistanâ bakur ji."

Serokên Kurdistanâ Iraqê gelek caran pêşniyar ji PKK'ê re birine ku ew li ser hûdûdê Tirkîyê tevgerên çekdarî çênekin û wan nekin tengasiyê. Ji bo vê ji Cepha Kurdistanâ Iraqê hemû îmkan pêşkêşî PKK kirine ku li ser axa rizgarkirî xebata xwe ya siyasi bikin. Lî PKK ne ev daxwazîn wan qebûl kirin, ne ji dev ji tevgerên xwe yên çekdarî li ser hûdûdê wan li hember Tirkîyê, berdan. PKK bi vî tişti ji nema, hilbijartinan demokratik, meclîsa wan û hukûmeta wan bi xayînîyiye bi nav kir û got ku ev şer ne şerî birakujiyê ye, şerî li dijî xayînan e.

Lê pişî îlankirina Dewleta Federe a Kurdistanê, hem ji bo birîna zimanê Tirkîyê ku dibêje "li bakurê Iraqê valahiya otoriteyê heye," hem ji bona bicihanîna pêwîstiyên dewletbûnê

îraqê" di 16'ê Çiriya Pêşin de ji herêmâ Uluderê û di 18'ê Çiriya Peşin de ji ji Şem-dînliyê bi hêzên xwe yên reşayî di bin siya hêzên hawayî de êrişen mezin birin ser kampê PKK'ê. Li gor nûçeyan; ordiya Tirk bi 20 hezar leşker, komando, bi balaflîrên herbê û helikopterên Kobra, bi tank û toparı şerî PKK'ê dike. Dîsa li gor nûçeyen Tirkan di êrişan de û bi taybetî ji di eblûqa herêmâ Haftanîn de bi sedan endamên PKK'ê kuştine. Lî PKK ji dibêje me bi sedan eskeren Tirkan kuştîye.

Serokwezîrê Tirkîyê Süleyman Demirel û Serokê Erkanî Herb Dogan Gunes gotin ku; "Heta ku vê avzêlê (pengav) zûwa nekin, ewê leşkeren xwe ji herêmê venekişinîn."

Di eslê xwe de ev ope-rasyona dewleta Tirk ne tenê li dijî PKK'ê ye, her wisa ew dixwazin Dewleta Federe a Kurdistanê hilweshîn, yan ji gav bi wan bîdin avêtin ku ew qerara îlankirina Dewleta Federal paşave vekişînîn.

Li ser êrişen Tirkîyê, Meclîsa Netewî a Kurdistanê, hukûmeta Kurdistanê û Celal Talabanî beyan dan ku; bila Tirkîyê leşkeren xwe ji ser axa me paşve vekişîne. Lî li gor beyanên serokwezîr, serokê erkanî herb, wezîrî derve yê Tirkîyê, leşkeren Tirk iro niye-ta paşve vekişandinê tune-ye. Ji ber ku ne li hundirê Tirkîyê, ne ji li welatên din tu dengen nerazibûnî li ser êrişâ Tirkan derneket.

Pişî ketina ordiya Tirk nav Kurdistanâ Iraqê, musteqbelê dewleta federal a Kurd ji şelûtir bû. Ji ber ku tev dewletê cîran hebûna dewleteke Kurd ji xwe re wek xetera herfî mezin dihe-sibînin. Ü ji zûde ye ji bo nehêlanâ wê ketine kefte-le-teke mezin.

Êrişâ Ordiya Tirk

Lê wexta şerî Pêşmerge û PKK'ê dom dikir, dewleta Tirk fersendek mezin bi dest xist û bi bahana "parastina sînorîn xwe ji te-rofîstan" û "hebûna valahiya otoriteyekê li bakurê

Lewend Fîrat

Nameyek vekirî ji bo nivîskarê Welat û hevalê min N. Yaruk

Dijayetyen rojane û qezencen dûr û dirêj

Nimet Aydin

Hevalê hêja, dema cara pêşî ez di nav rûpelên Welat de rastî navê te hatim, bisirandineke kêfxwesiye bi ruyê min ket; hevalê min ê delal bûye rojnamevan û ya girîngir jî bi Kurdî dinivise.

Lê dema çavê min bi maqela te ya bi sernîvîsa "Rojnameya Armanc berdevkiya kê dike" ku di hejmara 33'an a Welat de hatibû weşandin, ket, di ciyê xwe de şeqizim; sedema şeqizandina min ne ji bo ku te li Armancê rexne girtiye; Sebebê şeqizandina min zimanê te yê êrîşkar û mantiqê te yê sivik bû. Nijadê ku min nas dikir, xwedî berpirsiyar û tolerans bû.

Dema mirov nivîsa te dixwîne, di cî de tê digihê ku ev nivîse ji bo rexnekirina hin dîtinên Armancê hatiye weşandin. Wek ku tu bi wezîfe êrîş Armancê bikî, ci tê ber devê te rast-ne rast tu dibêjî. Tu bi çavekî piçûk li rojnameyen ku li derveyî welat derdikevin dinêrî û tinazê xwe bi Armancê dikî. Tu me hemû xebatkarê Armancê dikî endamên rîxistinêkê û mora reformistîyê li me dixî. Û ne ev tenê, ji ber ku me gotiye Ozgur Gundem rojnameyeke nêzî PKK'ye tu me dikî "sîxur" û bi "cezakirinê" me tehdit dikî.

Hevalê delal:

Armanc rojnameyeke mehaneye û her meh di wexta xwe de derdikeve. Xebatkarê Armancê bi imkanen xwe yên maddî û bi keda xwe ya fizikî û rewşenbirî wê derdixin. Rast e Armanc li derveyî welat, li Swêdê derdikeve. Ev ciyê serbilindî û pesindariyê ye ku Kurd li dervayî welat jî hewil didin ku bi kovar, rojname û xebatîn xwe mil didin têkoşina gelê Kurd. "Penaber û mişexten" gelê Kurd li "bihîştê" bin jî li mala xwe rûnanin; Armanc, Serxwêbûn, Berxwedan, Kurdistan Press, Roja Nû derdixin. Hêvidar im Armanc ji rojekê wek Rewşenê ji "buhuşa" derewin bar ke, here buhuşa rastîn. Qelsbûn û xurtbûna rojnameyekê izafî ye, li gor interesa mirovan diguhere. Vê ye-kê ne tu û ne jî ez karim tayin bikin. Lê gotina te ya ku Armanc "li dijî têkoşina netewî" ye, ne rast e û tesbîtek gelek bê însaf û bê wijdan e. Rast e, nivîsen Armancê ne li gor fîkrîn tene û carcana wan fikra jî rexne dike. Armanc ji roja ku derketiye û heta iro bi nûçe komentar, hevpeyvîn û bi lêkolînên xwe li hember hemû dewleten ku Kurdistan kîrine kolonî şer kirîye. Û platforme demokratik e.

Armanc berdewama tradisyonâ Hawar û Tîrêjê ye. Ez gelek kêfxwes im ku iro gelek nivîskarê ku bi Kurdî dinivisîn, di ekola Tîrêj û Armancê de gîhistîne û iro di Welat û di hin rojnamen din de bi Kurdî dinivisîn.

Hevalê minê delal;

Em Kurd divê ne bi çavekî wek hevalbend an dilxwazê xete-kê, li doza gelê Kurd û bûyeren rojane binêrin. Em ji bo ku riye-kê ji vê rewşa ne xweş, perîşan a gelê Kurd re bibînin, bûne xwe-

diyên fikrekê û li gor wê fikra xwe, xwe nêzikî rîxistîneke siyasi dibînin. Yanî divê tu carî berjewendiyen rîxistîni nekeve pêşîya berjewendiyen netewî.

Mehabad di dilê me Kurdan de pirr şerîn e. Evîna me ya dawîn bû. Ji ber wê şerîniyê bû bavê te, navê birayê te danî Mehabad. Qonaxa Kurdistanâ Başûr iro gîhistiyê, ji ya Komara Mahabad pirr pêşdetir e. Şansê jiyanîna wê jî pirtir e. Em iro bi serokatiya Kurdistanâ Başûr re bin an ne pê re bin, vatinî û erkê her Kurdeki ye ku wê çeperê biparêze. Ew çeper dema ewle bibe, sitara herî mezîn e ji bo gelê Kurd. Divê em iro ji wan dijayetyen rojane bifilitin, vê qezencê bibînin.

Heger Armancê di vê sala dawîn de giraniya xwe dabe ser Kurdistanâ Başûr, ji ber vê yekê ye û ne tiştekî xelet e.

Di nav nivîsa te de bêyî heqaret, súcdarkirinê bê sedem, infomasyonen ne rast, wek rexne ku te li Armancê girtibe û mirov karibe bersîva wê bide, nûçedayina bûyerâ Şîrnexê ye.

Ji bo ku xwendevan tê bigihên ew ciyê ku te lê rexne girtiye ji Armancê neqlî vir dikim:

"Lê li aliye din, PKK'ê ji wek gelek caran li ser êrîşa xwe beyanen li diji hev dan. Carê got 'erê me kiriye û emê bikin'. Car got 'ne me êrîş nebirîye, ev provakasyona dewletê ye'. Tê zanîn rojnameye 'Ozgur Gundem' ku nêzî PKK ye, di 21'ê mehê de nivîsi ku: 'PKK'ê di 18'ê mehê de avetiye ser Şîrnexê û avahîyen Emniyet û Fermendariya Eskerî daye ber gulleyan'. Li Ewrûpê ji berpirsiyaren PKK'ê beyan dan û gotin ku 'em ji bûyeren Şîrnexê agahdar in'. Lê pişti pênc rojan, serokê PKK'ê Abdullah Ocalan beyanek da eyñî rojnamê û got ku 'Gerîlayek bi tenê jî neketiye Şîrnexê'.

Lê tu di nivîsa xwe de dibêjî "ne PKK û ne jî berpirsiyaren partîyê yên Ewrûpa, bi tu awayî ne-gotine ku me ev êrîş kiriye".

Em nûçeya ku Ozgur Gundemê ya ku roja 21'ê Tebaxê de çapa Ewrûpa de, di manşetê de dabû "PKK avêt ser Şîrnexê" deyîn aliye. Pişti bûyerâ Şîrnexê bi sê rojan di radyoya Swêdî, beşa Tirkî de berpirsyarekî PKK'ê di beyana xwe de got; me avetiye ser Şîrnexê, lê ne wek berdevkêne Tirkan dibêjin bi 1500 kesi. Bi qewetek weha mezîn me biavêta ser, me yê Cizîr jî rizgar bikira". Ev beyan di BBC de jî hat dubarekirin. Her di eyñî rojê de, di BBC de, bi Abdullah Ocalan re hevpeyvînek hat weşandin. A. Ocalan bi gotinê xwe îma kir ku yên avetiye ser Şîrnexê ew in. Bi hindikayî ne got, "ne em in". Pişti bûyerê bi 5 rojan hîn serokê wê PKK'ê A. Ocalan, got "ne em in".

Nuha pişti rewş weha be, Armanc wek rojnameyeke Kurd rabe qala vê rastiye neke, her roj li gor beyanen PKK'ê şela bide, xwe biguherîne ma wê bibe rojnamevan!!! Ozgur Gundem got "PKK

BEROS



Mahmûd Lewendî

Dewleta Kurdî ya Federe û Dewleten Kûkla

Eman gidî zû kin, lez kin Tirkî ya ku me heta nuha dixşiyarbin, li Rojhilata Navîn dewleteke kûkla li ber avabûnê ye, ev dewleta kûkla ku bi destê emperyalizmê çedîbe tahlûkeyek gelek mezîn e ji bo me Kurdan, cunkî wê TV ya wan bi Kurdi be, mekteb bi kurdi bin, leşker wê bi Kurdi talîmî bikin, yanê bi kurtî wê her tişte wan bi kurdi be, içar ev yeka jî ji bo me talûkeyek mezîn e. Çimkî em ji xwe re carê fêri Erebî Tirk û Farisi bûne, ji mektebê bigre heta karênen xwe yên burokratik jî daخî bi zimanen wan dikin. Ev nîmeten hanê wê hemû ji destê me herin. Zarokên me wê içar dev ji van zimanen berdin dest bi Kurdi bikin. Edebîyat û tarîxa Erebî,

avakirin, li dij wan jî derkevin. Yanê nuha ev Iraqa ku heye di wexta xwe de kûkla bû, ji alî İngilîzan ve hatibû avakirin, Kuveyt, Bahreyn, Urdun, Lubnan, İsrail, Surîye û hîn gelek dewleten din ku di wexta xwe de ji alî emperyalizmê ve hatibûn ava kirin divê ku em ji bo hilweşandina wan jî şer bikin. Yan na wê dunya ji ber van dewleten kûkla berbi xerabûnê biçe. Loma, divê ku em hemû bi hev re dunyayê ji van dewleten kûkla xelas bikin.

Bijî dunya me ya xweşik û gûlover û topik!

Bimre dewleten kûkla û xwaro-maro û nexweşik û nerindik!

MÊRÊ MIN GOT



Jinek ji jinikeke din dipirse:
-Ma tu û Rizgo hîn bi hev re dimîn?
-Na welle, me dev ji hev berda!
-Çima?
-Ez xapandim, jina wî heye ji min re nedigot!
-Tu ji ku dizanî jina wî heye?
-Mêrê min got!

DI POKERÊ DE QEZENC KIR!



Mudirê hepsî ji gardiyan dipirse:
-Eêê, hela bibêje, mahkum çawa reviya?
-Kîfîta wî hebû!
-Qey ji we dizibû?
-Na mudirê min, di pokerê de gezenc kir!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgin

Japoni bi teknîkeke nû dikarin deng biguhezin ronahiyê. Guhestina deng bi ronahiyê di fizikê de şoreşek e. Bi vî awayî kesen kerr dê bikarîbin müzikî bi saya tîrêjîn ronahiyê bixwînîn.

İstasyona asûmanî ya Rûsan, Mir, ji sala 1986'an û wir de li asûmana ye û lêkolînan dike. Lê belê astronotên ku lê dimîn tenê ji wextê xwe % 20 ji bo lêkolînê xerc dikin. Sebeba vê yekê pir balkêş e. Herçiqas Mir bi aleten teknîki tije be jî, ji % 90'ê wan bi kér nayen. Tişte ku KGB ji astronotan dixwaze tenê % 10 - % 11 dikarin bi cih bînin. Tişte herî baş ku Mir diafirine krîstal e. Di

Mirê de firne hene û di van firinan de ji maddeyên li asûmanê krîstal çedîkin û dişinîn dinê.

Nexweşîya Malarya li zêdeyi 100 welatan belav bûye. Nêzî du milyar insan di bin rîska ketina nexweşîya Malaryayê de ne.

Organa bêhnstendinê di dawiya pozê mirov de ye û rasterast girêdayî meji ye.

Masiyê ku di ava şerîn de dijî û navê wî yê Latinî "Pa benk" e, masiyê mezintirin ê ava şerîn e; graniya wî dikare bigihiye 336 kg. û dirêjahiya wî ji dikare bibe 4,5 M.

Wek tê zanîn jinê ducan (bi hemle) di destpêkê de ji xwarinan aciz dibin û tişte ku dixwin, vedirêsin. Li gor Dr. Margie Profet li Universita Kaliforniyayê li DYB; bi vereşandinê jinê bi du-can zarokên xwe ji jahrê di nav xwarinê de diparêzin.